


## Di wêjeyê de Erebê Şemo

"Gelê ku zimanê xwe diparêze di rê de bi pêş di-keve; yên dinivîsin vê nasnameyê didin jiyandin." Mîrateya ku Erebê Şemo di warê wêje, çand û nasnameyê de hişt, bi taybetî di nîveka sedsala 20. de di civaka kurd de... ***Arslan Ozdemîr/R.5***



## Jin û berxwedan

Jin di domdariya dîrokê de her tim ji bo parastina azadî û rûmeta xwe di nava tekoşîn û berxwe-danê de bûne û li gor vê yekê jî roj bi roj asta te-koşîna xwe mezintir kirine. Jinan di hemû qadên jiyanê de cihê xwe girtine û rist... ***Necah Ibrahîm/R.2***



## Têkoşîna hevpar

Teror û anarşiya bloka faşîst dikare bi têkoşîna hevpar têk biçe. Hişmendî, hiqûq, demokrasî, exlaq, nirxên insanî, rastî di devê tivingê de ne. Nijadperestiya Îttîhat û Teraqiyê wek salên 1915an radîkal bûye... ***Medenî Ferho /R.8***


9 - 15 Kanûn 2024
Hejmar: 260
Buha: 15 TL
rojname@xwebun.org

# xwebûn

xwenasîn e


## Nav cuda ye hiş yek e

Şerê li Rojhilata Navîn zêde dibe. Li aliyekî şerê Israil û Hamasê, li aliyekî şerê Rûsya û Ukrayna, li aliyê din şerê ku komên çeteyan li dijî gelan bi pêş dixe didome. Di hefteyên vê dawiyê de Heyet Tehrir El Şam (HTŞ) ku kok û hêza xwe ji El Kaide û El Nusra/DAIŞê digire gelek tax û gundên Helebê û Hemayê bi dest xistin. Ji ber êrîşên komên çetey-an ên girêdayî Tirkiyeyê û HTŞê koçberên Şehba û Til Riftahê careke din koç kirin û derbasî Tebqa û Reqayê bûn. Gerînendeyê Saziyên Kurdên Sînornenas Kadar Pîrê der-barê geşedanên li Bakur û Rojhilatên Sûriyeyê de pirsên me bersivandin.... ***Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî/R.4***

## Kurd li ber xwe didin

Dema ku em dibêjin baskên Îranê qut kirin û xwestin ku Hamas-Hîzbu-lahê tune bikin çavkaniya çareseriya pirsgirêkan ne yek e. Hinek dibêjin Heleb, hinek dibêjin diyalog girîng e. Êrîşên Îsraîlê jî Îran li Sûriyeyê lawaz kir. Derbên ku Îranê xwarin, bandor li ser Esad jî kir. Mîna ku agirbesta li Lubnanê dihat pêkanîn û Sûriye jî careke din ber bi dojehê ve hat birin. Dema ku Tirkiyeyê dixwest bi diyalogê dagirkeriya xwe bidomîne, Esad ev yek qebûl nekir. Devlet Bahçelî got, hê tiştek dereng nîn e. Hemû hesabên xwe li ser naskirina rêveberiya xweser a ji bo kurdan esas digirin. Herwiha Erdogan got serkeftinek mezin û... ***Enes Yildiz/R.8***

## Civaka ku li ser koka xwe şîn dibe

Civaka ku li ser hîmê xwe şîn dibe Bi êrişên li ser Helebê re li Sûriyeyê pêvajoyeke nû hate destpêkirin. Wisa diyar e ku ev pêvajoya bi perspektîfa NATOyê bi pêş dikeve dê hevsengiyên li herêmê serûbin bike. Di vir de hêzên li ser dînamîkên xwe yên bingehîn disekinin dikarin xwe li ser piyan bigirin û hebûna xwe bidomînin. Bi hegemonyaya Amarîka û Yekîtiya Ewropayê şerên nû yên li Rojhilata Navîn tên meşandin. Gelo ev şer ê zêdetir bibin? Bi van şeran re hêzên hegemon li herêmê çi dikin armanc? Aşkera ye ku mirov nikare bersivên zelal bide van pirsên binge-hîn ku qedera herêmê diyar dikin. Lê tiştа aşkera û diyar... ***Felemez Ulug/R.6***



## Rejîmê fêlbazan o bîpolar

Êdî Tirkîya de "gerontokrasî" est o. Yanî îqtîdarê kokiman est o. Îdarekarê kokimî yan pîrî seba ke îqtîdarê xo heta peynîya cuya xo bipawê, her tewr "fêlbazîye" kenê. Nê kokiman ra yew Erdogan o, o bîn zî Bahçelî yo. Yew padîşah o, o bîn sey "sedrazamî" xebitîyeno. Padîşah ferman dano, o bîn nê fermanî desinde ano ca. Coka karê Bahçelî destpêk ra heta peynî pabesteyê waştişê Erdoganî yo. Erdoganî de nika tersê vîndîkerdişê îqtîdarî est o. Çike goreyê qanûnê bingeyî hinî nêeşkeno serokkomarîye rê "namzed" bibo. Êdî derya qedî-ya, rejîmo xeripîyaye resa asta peyêne. Nika verê Erdoganî de dide rayîrî est ê. Yan o do weçînayîşê verênî bikero, yan zî qanûnê bingeyî yê newî bikero. Seba weçînayîşê newî her çî destê ey de nîyo. Çike parlamento de ganî 360 par-lamenterî bêrê têhet û raye bidê ke weçînayîşo verên bêro kerdene. No zî bes nîyo. Partîyanê muxalîfan ra CHP vano ke ganî weçînayîşo verên zêde herey nêbo... ***R.9***

# Parastina Rojava ferz e!

Ji bo parastina nirxên kurdan ruh, berxwedan û yekitiya kurdan a li dijî komên çekdar pêwîst e. Divê êdî kurd li dijî bermayiyên DAIŞê têbikoşin û îro parastina Rojava li ser hemû kurdan ferz e

Di vê pêvajoya şerê dinyayê yê sêyemîn de armanca dagirkerên Kurdistanê dîsa bêstatu hiştina kurd û Kurdistanê ye. Lewra li gelek deveran tên gel hev û li dijî desketiyên kurdan proje û polîtîkayên nû saz dikin. Pêşengiya vê yekê jî Dewleta Tirk dike. Bi taybetî li gel şerê di navbera Îsraîlê û Hamasê de Dewleta Tirk bi temamî derveyî vê projeya nû mabû. Rist û mîsyona Îsraîlê li Rojhilata Navîn zêdetir bû û herwiha bala hemû dewletan çû ser vî şerê di nabera Îsraîl û Hamasê de. Dewleta Tirk jî ji vê yekê sûd wergirt û çeteyên bermayiyên DAIŞê komî ser hev kirin, çek û cebilxane dan van çeteyan û berê wan da Helebê. Çeteyên ku bermayiyên DAÎŞê ne li gelek deveran êrîş birin ser herêmên rojavayê Kurdistanê. Lewra ev hêzên navneteweyî li dijî van dîmenan ker û kor in. Kurd ji bo destkeftiyên xwe biparêzin divê Rojava biparêzin.. ***Huseyîn Çatikkaş/R.6***



## Duh DAIŞ dan pêş îro HTŞ û OSO

Ji 27ê Mijdarê ve çeteyên Cebhet El Nusra-HTŞ êrişê Helebê û gundewarên wê dikin. Di encamê de niha piraniya Helebê di destê çeteyên HTŞê de ne. HTŞ piştî ku ket Helebê berê xwe da başarê Hemayê û gelek deverên din. Di êrişên HTŞê de îşkence Kurdan û şêniyên herêmê tê kirin. Gelek kesên ku hewl didin xwe bigihînin nav Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di rê de dibin hedefa çeteyan. Kesên ku niha ji ber êrîşên çeteyan neçarê koç-beriyê bûne di nav zor û zehmetiyeke mezin de hewl didin xwe bigihînin herêmên bi ewle. Em der barê ev êrişên ku pêk tên û trajediya ku tê jiyîn bi Dayika Şemê ya ku li Şengalê di êrişên çe-teyên DAIŞê de ji 30 zêdetir endamên malbata wê hatibûn kuştin re axivîn. Dayika Şemê komkujiya ku di ssala 2014an de li Şengalê pêk hatibû bi bîr xist û got: "Wek tê zanîn çeteyên DAIŞê li ser gelê Êzidî komkujiyeke pêk anîn û gelek tehdê li me kirin. Ew çe-teyên DAIŞê yên ku êrîşê me kirin niha navekî din li xwe kirine û niha li rojavayê Kurdistanê êrîşî Kurdan dikin. Her çend wan navê xwe guhertibe jî rêbazên wan yek in. Ev hişmendî duh li Şengalê û Efrînê komkujiyan kir û niha jî bi heman êrîşan dikin... ***R.2***



## Kes nikare êrîşê bîne ser rastiyê

Bi pêşengiya Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê ya Amedê (DTSO) û TUYAP'ê di navbera 30'ê mijdar û 8'ê kanûnê de li Navenda Kongre û Fûarê ya Mezopotamyayê ya Yenîşehîra Amedê 8'emîn pêşangeha pirtûkan hat lidarxistin. Di pêşangehê de gelek weşanxaneyên kurd têde cihê xwe girtin. Bi sedan nivsîkar û rewşenbîr beşdarî pêşangehê bûn. Her wiha mirov dikari bêje ev pêşangeha ku li Amedê hat lidarxisin wekî pêşangeha herêmê bû. Lewre ne tenê ji Amedê ji gelek barajên derdorê jî xwîner başdarî bûn. Naverok û zimanê panel û ber-nameyên pêk hat. Li ser pêşangeha îsal û bi taybetî jî desteserkina pirûkên Weşanxaneya Aramê Xwediyê îmtiyazê yê Aramê Hakkî Boltan anrî ziman ku eleqeya pirtûkan başe... ***R.11***

## Vê carê planên wan dê vala biçin

Vê carê planên wan bi ser nakevin Çeteyên di bin kontrola Tirkiyeyê de bangewazî li HSDê û hêzên kurd kirine. Bi kurtasî wiha dibêjin: "Em li dijî Esad şer dikin... Em fersendekê didin we, tevî çekên xwe ji Helebê derkevin û derbasî herêmên xweser bibin... Em kurdan wekî perçeyekî ji Suriyeyê dibînin. Kurd jî xwedî heman mafên wekhev in... Parastina we û pêkanîna mafê jiyaneke birûmet peywira me ye..."
Hê di ser van gotinan de demek dirêj neborî nûçe û dîmenên ku çete êrîşî sivîlan dikin belav bûn. Dev ji parastinê berdin, riya otobûsên ku hewl didan sivîlan veguhezînin heremên ewle girtin. Gel bi derfetên xwe dev ji cih û warê xwe berda. Gelê Efrînê ku careké ji cihê xwe bûyî careke din kete ser ri-yan û koçber bû. Mirov ji bo ku nekevin destên çeteyan dawî li jiyana xwe tînin. Di van demên dawî de du nûçeyan gelek bala min kişand. Yek jê nûçeya li ser Evdirehman Xelîl Murşîd bû. Murşîd yek ji avakerê Partiya Tifaqa Demokratîk û Neteweyî ya Suriyê bû... ***Zinar Ronî /R.7***

Necah Ibrahîm

# Jin û berxwedan

## Herçiqas çeteyên DAIŞê ji milê leşkerî ve heta astekê hatibin şikandin jî, hê hişmendiya wan di ruhê çeteyên wek HTŞê de berdewam dike û jinên pêşeng dike hedef

Jin di domdariya dîrokê de her tim ji bo parastina azadî û rûmeta xwe di nava tekoşîn û berxwedanê de bûne û li gor vê yekê jî roj bi roj asta tekoşîna xwe mezintir kirine. Jinan di hemû qadên jiyanê de cihê xwe girtine û risteke bêhempa lîstine. Lê tevî ev ked û rista wan her tim mafê wan hatiye xwarin û rastî tundiyê hatine; helbet her tim jinên zana, çalak û bi hêz hebûne û li dijî tundiyê serî netewandine.

25ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Jinan a Navneteweyî jî wek têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan e, vê rojê bingeha xwe ji têkoşîna xwişkên Mîrabel girtiye. Patria, Minerva û Maria Teresa li komara Domînîk çalakvanên siyasî bûn û li dijî pergal û siyaseta serokê komarê Rafael Trujillo serî hildabûn û têdikoşiyan. Di 14ê hezîranê de di dema şahiyê de Rafael Trujillo hewl dide ku Minervayê tacîz bike, Minerva helwesta xwe nîşan dide û şeqamê li Rafael dixe. Piştî wê bûyerê bi pêşengiya Minerva ku li zanîngehê beşa parêzeriyê dixwend, rêxistina bi navê 'Tevgera 14ê Hezîranê ava kirin ku navê xwe ji dîroka şeqama Rafael Trujillo xwariye digire û perperîkê jî weke nîşaneya tevgerê hildibijêrin.

Piştî wê bi demekê Rafael Trujillo fermana dîlgirtin û îşkencekirina hersê xwişkan dide û Minervayê ji bawernameya wê mehrûm dike. Paşê hersê xwişk ji girtîgehê derdikevin û di 25ê Mijdara 1960î de bi rengekî hov ji aliyê çekdarên Rafael Trujillo ve tên kûştin. Ev bûyer dawiyê li pergala Rafael tîne û ew jî 6 mehan piştî kuştina xwişkên Mîrebal tê kuştin.

Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî di 17ê Kanûna sala 1999an de biryar da ku 25ê mijdarê roja kuştina xwişkên Mîrebal bibe roja cîhanî ya têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan û hemû hikûmet, rêxistinên navneteweyî, rêxistinên mirovî û yên jin ji bo têkoşîna li dijî tundî û parastina mafên jina peywira xwe bînin cih.

Têkoşîna xwişkên Mîrabel ên 59 sal berê niha hatin kuştin niha hê berdewam dike. Beriya ku xwişkên Mîrabel û piştî wan jî bi dehan jinan li dijî dîktatoriyan li ber xwe dane. Ji Jeanned Arc bigire heta Fata Reş, ji Clara Zetkîn bigire heta Leyla Qasim, ji Rose Luxemburgê bigire heta Sakîne Cansiz û Hevrîn Xelef, jinan têkoşîn û berxwedana xwe mezin kiriye.

**Tekoşîna li dijî hişmendiya serdestiyê**

Di roja me de zext û tundiya li ser jinan tê meşandin, kêmasiya berpirsên wê desthilatdariya dewlet û hişmendiya zilamê paşverû ye. Her wiha di hin cihan de ji ber bêrêxistinbûna jinan jî kêmasî dertên holê. Lê li cihê ku jin nikaribin derfeta rêxistinbûnê bi dest bixin de dê her tim di destê dewletên faşîst û zilamê paşverû de bibin amûr. Ji ber ku jin nikarin xwe di nav vê pergalê de bi awayeke xurt birêxistin bikin lewma li seranserê cîhanê bûne wek amûreke fihûş, kirîn û firotinê. Anku bi sedan salan e rêxistineke dewletî û desthilatdar di civakê de hewl daye xwe bike hêz, xwe bi sazî bike û ji bo ku hebûna xwe bide parastin, hêza civakê ya esasî û ya sereke jinan bi rê û rêbazên cuda bigire bin serweriya xwe, li gorî hişmendî, serwerî û desthilatdariya xwe reng bide wê û wê li gor wê bide meşandin. Bi vî awayî hewl daye ku destwerdanê li cewhera jinan û hêza wê ya civakbûnê bike. Herwiha li gor xwe yan berevajî bike yan jî tune bike. Anku xwestiye jineke li gor xwe ava bike û bi toreyên namûsê ve girê bide. Lê belê her dem li dijî hişmendiya dewletê ya zilamtî, li dijî vê hişmendiya ku rastiya jinan berovajî dike her tim pêşengên tevgera jinên ku têkoşîn meşandine û serhildan bilind kirine hene, pêşengtî kirine û heqîqeta jinan parastine.



**Bûyerên kuştina jinan**

Axaftvan, akademîsyen û edîtora kovara Jinolojiyê û endama Navenda Jineolojiyê Nagihan Akarsal 4ê Cotmehê li bajarê Silêmaniyê yê başûrê Kurdistanê li ber deriyê mala xwe rastî êrîşa çekdarî hat û hat kuştin. Nagihan Akarsel rojnamegerek bû ku di gelek rojname û kovarên jinan de kar dikir û gelek kar û xebatên wê yên rewşenbîrî û civakî hene. Nûçegihana Al Jazeera Şîrîn Ebû Aqla di 11ê gulanê bi guleyên artêşa Îsraîlê hat kuştin.

**Jinên li Rojhilata Navîn**

Jinan pêşengiya şoreşa Îranê jî kirine. Herî dawiyê 16ê îlona 2022yan piştî kuştina jina ciwan a Kurd Jîna Emînî, di dema ku ji aliyê Hêzên Erka Xweparastinê (Polîsên Exlaqê) ve hatibû binçavkirin de li seranserê rojhilatê Kurdistanê û Îranê di pêşengiya jinan de serhildanên mezin pêk hatin. Li gorî Komîteya Jinan a Encûmena Neteweyî ya Berxwedana Îranê, di dema serhildana li seranserê welêt de, hêzên ewlehiyê û pasdaran herî kêm 700 kes kuştin.

Gelên li Sûriyeyê ji destê hikûmeta heyî gelek êş, azar, girtin, kuştin û bişaftin dîtin. Di serî de ya ku herî zêde ji vê siyaseta ku hatî meşandin bandor bûn jî jin bûn.

Lê bi Şoreşa 19ê Tîrmehê re, di serî de jinên Kurd, tevahiya jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di hundirê şoreşê de şoreşek pêk anîn. Jinan di hemû saziyên rêxistinî de cihê xwe girtin.

Jinan bi salên şoreşê re karibûn baweriya civakê bêtir qezenc bikin û bandora xwe li tevahî jinên Sûriyeyê, Rojhilata Navîn û cîhanê bikin. Tevî serkeftinên ku bidest xistin jî lê heta niha pêwîstiya wê zêdetir bi têkoşîn û xebata li dijî adet û kevneşopiyên ku serbestiya wan bi qeyd û bend dikin heye. Ji ber ku tekoşîna jinan ji bona serbestiyê hê berdewame û pêwîst e ku jin bikaribe guhertinê li cem xwe ava bike, weke din hişmendiya mêran jî biguherîne û bi vî awayî guhertinekê di civakê de jî çêbike.

Hemû saziyên mafên mirovan ên qaşo bi navê parastina mafên mirovan û mafê jinan bang dikin berovajî vê yekê temsîla hişmendiya zilamê serdest û zagonên kaptalîzmê dikin. Ji ber wê yekê hemû kiryarên dijmirovî yên ku li dijî jinan tên meşandin zagonên pergala mêrperest wan rewa dibîne û hemû kujerên jinan bêhesab dimînin û kes dengê xwe ji wan re nake.

Serweriya çeteyên DAIŞê li herêmê jî bandoreke pir xirab li ser jinan û civakê bi giştî kir, bi hezaran jinên Êzidî hatin kuştin, revandin û li bazaran hatin firotin. Herçiqas çeteyên DAIŞê ji milê leşkerî ve heta astekî hatibin şikandin jî, hê hişmendiya wan di ruhê çeteyên wek HTŞê de berdewam dike û bi hedefgirtina jinên pêşeng û yên ku cihê xwe di kar û xebatên rêveberiya xweser de digirin, dixwaze hişmendiya xwe bi bandor bike û bandora tekoşîn û xebata jinan a pêşengiya civakê dikin bê bandor bike.

Bi rêbazên şerê teybet û derûnî yên ku dagirkeriya Tirk, hêzên pergala Sûriyeyê û hêzên kapîtalîst li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yên ku bi giştî li ser hemû civakê, bi taybetî jî li ser jinan dide meşandin dixwazin ku qirkirina civakê û jiholêrakirina destketiyên rêveberiya xweser pêk bînin. Ji ber ku jin pêşengên civakê û pêşengên şoreşê ne û di hemû warên jiyanê de xwe dane ispatkirin û baweriya civakê qezenc kirine, hêzên desthilatdar jinan dikin armanc û dixwazin li hemû qadan û li her cihê ku tekoşîna azadiyê lê tê meşandin wan bêbandor bikin.

Herwiha di rewşa heyî de mirov dikare bibêje ku tundiya li ser jinan bûye gerdûnî û hişmendiya mêrên serdest dixwaze li her deverê serweriya xwe pêk bîne û ji milê zagonî ve jî dixwaze kiryarên ku li dijî jinan dide meşandin rewa bike û bi civakê jî li bin navê namûsê yan jî hincetên din rewa bike. Li gelek deveran jin ji hemû mafên xwe yên bingehîn, yên wek xwendin û tevlibûna nava kar û xebatên civakî bêpar dimîne û li bin navê nepêkanîna zagonên heyî tê kuştin, girtin û îşkencekirin. Li dijî van hemû kiryarên dijmirovî yên ku li dijî jinan tên meşandin, jinan di asta pêşengiyê de çarenûsa xwe xêz kir. Di serî de jinên Kurd û jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û bi rêya fikir û ramanên Rêber Apo şoreşa civakî pêk anîn û li dijî hişmendiya mêrên serdest rêxistina xwe ava kirin.

Jin gihîşt wê baweriyê ger ku ew bi xwe rêya xwe ronî neke û asta tekoşîna xwe bilindtir neke, dawiya hişmendiya mêrên serdest pêk neyîne, wê demê dê nikaribe bi rengekî serbest bijî û serweriya mêr ê her tim li ser wê bidome.

Herwiha jinan di Şoreşa Rojava de bi sekna xwe ya birûmet di nava jinên cîhanê de deng vedaye, ji bo jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Rojhilata Navîn û cîhanê bûye sembol û navnîşana berxwedan û azadiyê.

Medya Bal

# Dayika Şemê: Navê wan duh DAIŞ bû îro HTŞ

Ji 27ê Mijdarê ve çeteyên Heyet Tehrîr El Şam (Cebhet El Nusra-HTŞ) êrişê Helebê û gundewarên wê dikin. Di encama êrîşan de niha piraniya Helebê di destê çeteyên HTŞê de ne. HTŞ piştî ku ket Helebê berê xwe da başarê Hemayê û gelek deverên din.

Di êrişên HTŞê de îşkence Kurdan û şêniyên herêmê tê kirin. Gelek kesên ku hewl didin xwe bigihînin nav Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di rê de dibin hedefa çeteyan. Gelek kesên ku di êrişên çeteyan de jiyana xwe ji dest didin li ser rêyan tên binaxkirin.

Her wiha di vê pêvajoya koçberiyên de gelek malbat ji hev diqetin û agahî ji hin endamên malbatê nayê girtin. Kesên ku niha ji ber êrîşên çeteyan neçarê koçberiyê bûne di nav zor û zehmetiyeke mezin de hewl didin xwe bigihînin herêmên bi ewle.

Em der barê ev êrişên ku pêk tên û trajediya ku tê jiyîn bi Dayika Şemê ya ku li Şengalê di êrişên çeteyên DAIŞê de ji 30 zêdetir endamên malbata wê hatibûn kuştin re axivîn.

Dayika Şemê di destpêka axaftina xwe de komkujiya ku di ssala 2014an de li Şengalê pêk hatibû bi bîr xist û ev tiştanî ziman: "Wek tê zanîn çeteyên DAIŞê li ser gelê Êzidî komkujiyeke pêk anîn û gelek tehdê li me kirin. Ew çeteyên DAIŞê yên ku êrîşê me kirin niha naveke din li xwe kirine û niha li rojavayê Kurdistanê êrîşê gelê Kurd dikin. Her çend wan navê xwe guhertibe jî rêbazên wan ên êrîşê yek in û feraseta wan heman e. Ev hişmendî duh li Şengalê û Efrînê komkujiyan kir û niha jî bi heman awayî li Helebê komkujiyan pêk tîne."



**'Armanc tunekirin e'**

Dayika Şemê got ku armanca êrişan komkujî ye û wiha axivî: "Ew çete dixwazin Gelê Kurd ji holê rakin, koka Êzidiyan bînin. Ev daxwaza tunekirinê daxwaza Dewleta Tirk e. Bi destê çeteyên DAIŞ û çeteyên ku niha navê HTŞê li xwe kirine li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê êrîşan pêk tînin dixwazin bigihîjin armanca xwe. Dixwazin Kurdên ku nikarin qir bikin jî bikin bin destê xwe û hemû qirêjahiyan li ser wan bimeşînin."

Dayika Şemê wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em wek Gelê Kurd tu carî van kiryarên wan qebûl nakin û serî li ber wan natewînin. Em ê hesabê 74 fermanên ku li ser Êzidiyan pêk hatine jî û hesabên ev komkujiyên ku li her parçeyên Kurdistanê pêk tînin jî bipirsin."

**'Roja seferberiyê ye'**

Dayika Şemê di dawiya axaftina xwe de wiha bang kir: "Divê îro ne tenê em Kurd hemû cîhan li dijî hovitiya van çeteyan rabin û nehêlin ku Kurd û neteweyên din ji cihên xwe koçber bibin. Her kesên ku ji xwe re dibê hîsên mirovbûnê bi min re heye divê li dijî vê êrîşê rabe ser xwe. Ji bo me îro roja seferberiyê ye divê em li gor wî tevbigerin da ku komkujiyên mezintir pêk neynê. Divê herkes bi berpirsiyarî rabe ser xwe."

# Dilyar Cizîrî: Êrîşa HTŞê plan Astanayê ye

Rojnameger Dilyar Cizîri anî ziman ku ji bo pişt perdeya êrîşen HTŞê bê zanîn divê li 22 civînen Astaneye binerin û wiha got: “Di nava aliyên Astanayê de nakokiyên mezin hebûn. Êrîşên HTŞê yêm li herêmê di Astana de plan kirin.”

| Mehmet Alî Ertaş



Di 27ê Mijdarê de Heyet Tehrîr El Şam (HTŞ) li dijî gund û taxên Helebê dest bi êrîşan kir. Di nava 3-4 rojan de piraniya gund û taxên Helebê kirin kontrola xwe. Piştî HTŞê dest bi êrîşan kir, komên çete yên hêza xwe ji Tirkiyeyê digirin, li Şehba û Til Rifhatê jî dest bi êrîşan kirin.

Piştî êrîş zêde bûn Meclisa Xweseriya Rêveber ên Şehba û Til Rifhatê biryar dan ku herêmê vala bikin û derbasî herêmên ewle bibin.

Piştre zêdeyî 100 hezar welatî koçî Tebqa, Reqa û Herêma Kantona Firatê bûn. 20 erebeyên ku gelek welatî tê de bûn, li nêzî herêma Şêx Necar ji hêla çeteyan ve hatin revandin. Çete derketina welatiyan asteng dikin. Zêdeyî 100 hezar welatiyên koç kirin jî niha hewl didin di kamp û çadiran de bi cih bibin. Rêveberiya Xweser banga seferberiyê kir û xwest her kes ji aliyê xwe de alîkariyê bi koçberan re bike. Li aliyekî koçberiya welatiyan didome, li aliyê din Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhiatê Sûriyeyê hewl dide pêdiviyên koçberan bibersivîne.

**El Nusra-HTŞ û DAIŞ cêwî ne**

Têkildarî êrîşên li ser gel û geşedanên dawî Rojnameger Dilyar Cizîrî nirxandin kir. Rojnameger Dilyar Cizîrî anî ziman ku ji bo rewşa Sûriyeyê baş şirove bikin divê qala 22 civînên astaneyê bikin û wiha got: “Ew aliyên ku di civînên Astanayê de dihatin cem hev, di heman demê de di nava wan de nakokiyên pir mezin hebûn. Ji ber van nakokiyan di 22 civînan de nekarîbûn gavan bavêjin. Tenê li ser yek tiştî li hev dikirin. Ew jî dijberiya Rêveberiya Xweser û HSDê bû. Niha Eniya El Nusra ango Heyet Tehrîr El Şam (HTŞ) hêzeke girêdayî El Kaîde ye. Çekdarên wê di sala 2012an de li Sûriyeyê xwe bi cih kirin. El Kaîde serkêşiya Eniya El Nusra dikir. El Nusra û DAIŞ di salên 2014an de ji hev qut bûn. Lê ferqa herduyan tune ye. Her du cêwiyên hev in. Piştî ji hev qut bûn ji bo planên cuda hatin bikaranîn. Dema DAIŞ derket plana wan xeta Mûsil û Reqqa bû. Lê plana El Nusra planek dîtir e. Gelek çekdarên biyanî di navde hene. Serkêşiya wê dewleta Tirk û NATO dike. Ev hêz demekê li Idlibê hiştin û xwestin bi vê hêzê plan û projeyên xwe li ser Sûriyeyê ferz bikin.”

**Plana civîna Astanayê ye**

Rojnameger Dilyar Cizîrî bal kişand ser civînen Astanayê û wiha axivî: “Ev plana Astana ye. Beriya ev êrîşên HTŞê pêş bikevin di civîna Astanayê de li ser asêkirin û tunekirina Rêveberiya Xweser li hevkiribûn. Plan kiribûn ku êrîşek bisînor pêk bînin. Plan kiribûn ku li hin gundên derdora Helebê êrîş bikin. Lê Rûsya, Îran û hikûmeta Şamê, texmîn nedikirin ku dê êrîş fireh bibe. Bawer nedikirin ku artêşa Şamê jî bi vî şiklî hilweşe. Dema li dijî êrîşên mezin berxwedana Artêşa Şamê pêk nehat, senaryoya Mûsilê ku DAIŞê êrîş kir, dubare bû. Eniya El Nusra bi piştgiriya dewleta tirk erîş fireh kirin. Ev bû sedema feleketek nû. Bûyer û kuştinên ku rû didin, encama van planan e.”

**Ji bo parastina gel Şehba vala kirin**

Rojnameger Dilyar Cizîrî da zanîn ku dema dewleta Tirk jî temaşe kir û dît dewleta Sûriyeyê li ber xwe neda û Heleb hilweşiya, wê jî bi çeteyên xwe êrîşî Şehba û Til Rifhatê kir û xwest wê herêmê dagir bike û wiha lê zêde kir: “Hêzên Rizgariya Efrînê li wir komên biçûk bûn. Di navbera wan û herêma Rêveberiya Xweser de mesafeyek pir mezin heye. Korîdor nema û hatin dorpêçkirin. Hêzên Sûriyeya Demokratîk xwestin korîdorê vekin. Lê ji bo parastina korîdorê hêzek mezin pêwist bû. Herêmên nêzî wê di bin kontrola çeteyên dewleta Tirk debûn. Ji ber vê yekê Meclisa Şehba-Efrîn û Tir Rifhatê ji bo komkujiyên mezin pêk neyên biryar dan gel ji wir vala kirin. Hêzên Şehbayê di nava çend rojan de berxwedanek mezin nîşan dan. Lê şer dijwar bû. Wekî mijara Şengalê, dema HPG û YPG bi hawara Şengalê neçûna, dê komkujî mezintir bûya. Ji bo komkujî pêk neyê xelkê Şehba û Efrînê berê xwe dan herêma Reveberiya Xweser. Beşek şîa ku alîgirê hikûmetê ne jî tevî xelkê Şehba-Efrînê koç kirin.”

**Li Şexmeqsûd berxwedan heye**

Rojnameger Dilyar Cizîrî bal kişand ser rewşa taxên Eşrefiye û Şêxmeqsûd ên Helebê û wiha axivî: “Li van taxan hêzên parastinê berxwedana xwe berdewam dikin. Biryara parastinê dane. Dê berxwedanek dîrokî pêş bixin. Şêxmeqsûdê di dîrokê de gelek caran parastin kiriye. Efsaneyên dîrokî liv an taxan pêş ketiye. Niha dê disa parastina xwe bikin.”

**Seferberiyek mezin heye**

Dilyar Cizîrî li ser pêşwazîkirina koçberan jî ev agahî dan: “Her çend Rêveberiya Xweser amadekarî kiribe jî, di demek bi lez ev guhertin çêbû. Bi deh hezaran mezin, zarok, jin derbasî herêmê bûn. Zarok û kesên temen ji sermayê jiyana xwe ji dest didin. Ji ber sermayê nexweşî pêş dikeve. Lê xelkê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo wan hembêz bikin di nava seferberiyê de ne. Ji bo hemû bi cih bibin demek lazim e. Niha seferberiyek mezin heye. Niha hêdî hêdî gel derbasî tebqa û Kantona Firatê dibin. Pêwistî bi alîkariyek mezin heye. Em qala nêzî 130 hezar mirov dikin. Dibe ku hejmara koçberan zêdetir jî bibe. Niha rewş hinek aloz e. Pêwistî bi alîkariyek pir mezin heye.”

**Çapemeniya azad bişopînin**

Dilyar Cizîrî bang li hemû rojnamegerên kir ku rastiyê berovajî nekin û wiha bi dawî kir: “Em jî wekî rojnameger li vir rewşê dişopînin. Em jî wekî rojnameger bang li hemû gelê me yên hemû aliyên Kurdistanê dikin. Îro pêdiviya koçberan bi hemû cureyên alîkariyê heye. Ciheki lê bimînin tune û hêjmarek pir mezin heye. Pêwisti bi hevgirtinek xurt ya gelê Kurd heye. Me Yekîtiya Ragihandina Azad daxuyanî da. Me xwest dengê xwe bigînin rojnamegerên her derê. Em dibêjin bila çavkaniya sereke ya ragihandinê çapemeniya azad be. Ji ber ku propagandayek reş û siyasetek reşkirinê tê kirin. Navendên şerê taybet ji bo rastiyê berovajî bikin taybet dixebitin. Divê hemû alî û hemû rojnamevan çapemeniya azad esas bigirin. Her tiştên ku li ser medya dijîtal tê parvekirin ne rast e. Gelek agahiyên şaş û rastiyan reş dikin tên parvekirin. Bi taybetî dewleta Tirk serkêşiya propaganda reş dike. Bûyerên kuştin, talankirin pêş dikeve. Divê hemû rojnameger baldar bin û agahiyên rast û teyîdkirî parve bikin. Li vir çapemeniya azad heye dikarin rastiyê ji wan bigirin.”

# DAIŞ veguherî HTŞê

| Navenda Nûçeyan



Dewleta Îslamê ya Iraq û Şamê (DAIŞ) di sala 2006an de xwe bi rexistin kir. Lê bingeha wê heta beriya salên 2000î jî direjî dibe. DAIŞê di pêşengiya Ebu Bekir El Bagdadî de xwe bi rêxistin kir û li Iraq û Sûriyeyê belav bû. Di nîsana 2013an de Serokê milê Iraqê yê El Qaîdeyê Ebu Bekir El Bagdadî diyar kir ku bi Eniya El Nusra re bûne yek û navê DAIŞê li xwe kirine.

DAIŞ di Çileya 2014an de ketin nava tevgerê û di çile de bajarê Felluce yê Iraqê dagir kirin. Piştre li Ramadî şer kirin û gelek tax bi dest xistin. Li Sûriyeyê jî bajarê Rakka bi dest xistin û Reqqa ji bo xwe navend îlan kirin. Wekî Paytextê Xelîfetiya xwe îlan kirin. Di Sibata 2014an de Serokê El Qeîde Eymen El Zevahirî DAIŞ xist kontrola xwe. Di Hezîrana 2014an de DAIŞê êrîşên xwe mezin kirin û ketin Mûsilê. Artêşa Dewleta Iraqê li dijî DAIŞê li ber xwe neda û Mûsil teslîmî DAIŞê kir. DAIŞê di nava 6 rojan de Mûsil dagir kir û derbasî Tikritê bû.

DAIŞê xwe nêzî Bexdayê kir û hin taxên Bexdayê bi dest xistin.

Di Tîrmeha 2014an de Serokê DAIŞê Ebû Bekîr El Bagdadî derket pêşberî raya giştî û li Mizgefta El Nurî ya Mûsilê ku mizgefta dîrokî ye xutbe xwend. DAIŞê piştî wê berê xwe da Şengalê. Di 3ê Tebaxa 2014an de ketin Şengalê. Li ser peymana Bexda, Hewler û Enqereyê pêşmergeyan bi fermana Malbata Barzanî Şengal teslimi DAIŞê kir. Ewil herêma Sîncarê dagir kir. Piştre ketin Şengalê. Li Şengalê komkujî pêk anîn. Bi hezaran jinên êzidî revandin û dest direjî jinan kirin. Komkujiyek mezin pêş xistin. Piştî ku YPG, HPG bi hawara civaka Şengalê çûn, bi hezaran kesên ji civaka Şengalê ji destê DAIŞê rizgar kirin.

Çeteyên DAIŞê piştî li Şengalê komkujî pêk anî, di 15ê Îlona 2014an de ketin Kobanê.

Bi taybetî piştî di 19ê Tîrmeha 2012an de li Bakur û Rojhialtê Sûriyeyê şoreşa gelan pêş ket, bû hedefa hêzên navdewletî. DAIŞ a ku hêza xwe ji Tirkiye Katar û welatên cîhanê digirt jî li ser plana dewletan berê xwe da Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û xwest Kobonê dagir bikin. Di 15ê Îlona 2014an de li dijî Kobanê dest bi êrîşan kir û piştî şerê 134an şervanên kurd ên YPG, YPJê di 26ê Çileya 2015an de Kobonê ji destê DAIŞê rizgar kir.

Piştî DAIŞ li Kobanê têk çû êdî li gelek bajar û navçeyen din jî têk çû. Şervanên kurd ên YPG, YPJ û HSDê li gelek bajaran DAIŞ tek bir û bajar ji DAIŞê paqij kir.

HSDê di 17ê Cotmeha 2017an de piştî şerekî dijwar paytextê DAIŞê Reqqa ji destê DAIŞê rizgar kir.

HSDê di Adara 2019an de jî di operasyona Bahozê de axa dawî ji destê DAIŞê rizgar kir bi awayekî fizîkî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji DAIŞe paqij kir.

Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD), di 23ê Adara 2019an de li bajarokê Baxozê yê Dêrazorê piştî şerê dijwar dawî li DAIŞê anî. Şerê Baxozê bû şerê dawî yê li dijî DAIŞê û DAIŞ bi awayekî fizîkî tune bû.

Berxwedana ku HSDê li dijî rêxistina DAIŞê raber kir, tevahî cîhan mat kir. Nexasim berxwedana li Baxozê, şerekî pir dijwar bû. DAIŞê hemû hêza xwe di vî şerî de seferber kir. Lê di encamê de têk çû. Girîngiya şerê Baxozê jî ji vê tê, xeleka dawîn a şerê tunekirina DAIŞ`ê bû.

Lê her çend DAIŞ bi awayekî fizîkî têk çû jî, ji ber hêzên navdewletî li Idlib, El Bab, Ezaz û Efrînê dîsa hêzên çekdar bi rêxistin kirin û navekî din li xwe kirin, wekî berdewama DAIŞê ango cewiyê DAIŞê El Nusra û Heyet Tehrîr El Şam îro dîsa xwe nû kirin û derketin pêşberî gelê Rojhilata Navîn. DAIŞê ku 10 sal berê êrîşî Şengal û Musilê kirin û dagir kirin, îro bi navê HTŞê êrîşî Heleb, Hema û deverên din dikin û dagir dikin. Gelek nivîskar, rewşenbir û siyasetmedar destnîşan dikin ku ev plana Socî û Astana ye.

Hêzên Heyet Tahrir el-Şam (HTŞ) û Artêşa Netewî ya Sûriyeyê (OSO), weke meşa DAÎŞê ya ber bi Mûsilê ve ya di Hezîrana 2014an de ji Idlibê ber bi Helebê ve meşiyan û di nava sê rojan de bajar bi dest xistin. Hêzên rejîma Esad û hêzên Îran û Rûsyayê bêyî ku li ber xwe bidin, ji herêmê vekişiyan. Niha jî ketin Hemayê. Tê fêmkirin ku şerê heyî Şamê hedef digire û wê belav bibe li seranserê Sûriyeyê.

Weke tê zanîn; HTŞ, weke bi navguherandina El Nûsraya şaxeke El Kaîdeya Sûriyeyê û komkirina hin komên din pêk tê. Ji aliyê Brîtanya û Erebistana Siûdî ve bi awayekî çalak tê parastin. Tê diyarkirin ku bi DYE û Îsraîlê re jî têkiliya wê heye. Tê gotin ku bi awayekî têkiliya wê bi rêveberiya AKP-MHPê re jî heye. Artêşa Netewî ya Sûriyeyê jî ji komên aligirên Tirkiyeyê yên li Sûriyeyê pêk tê. Ji aliyê her kesî ve jî tê zanîn ku Artêşa Netewî ya Sûriyeyê ji aliyê rêveberiya AKP-MHPê ve hatiye organîzekirin û birêvebirin. Ev geşedan nîşan didin ku ev geşedanên dawî plana civînên Astanayê ye.

## NAV Û RENGÊ WAN CÛDA NE LÊ HIŞ YEK E

# Çete hêza lojîstîk ji Tirkiyeyê digirin

■ Rizoyê Xerzî

*Şerê li Rojhilata Navîn zêde dibe. Li aliyekî şerê Israil û Hamasê, li aliyekî şerê Rûsya û Ukrayna, li aliyê din şerê ku komên çeteyan li dijî gelan bi pêş dixe didome. Di hefteyên vê dawiyê de Heyet Tehrir El Şam (HTŞ) ku kok û hêza xwe ji El Kaide û El Nusra/DAIŞê digire gelek tax û gundên Helebê û Hemayê bi dest xistin. Şerê HTŞê yê li Heleb, Hema û herêmê didome. Ji ber êrîşên komên çeteyan ên girêdayî Tirkiyeyê û HTŞê koçberên Şehba û Til Riftahê careke din koç kirin û derbasî Tebqa û Reqayê bûn. Ji ber êrîşên çeteyan ên li herêmê dîsa bi deh hezaran kes koçber bûn û şer belav dibe. Gerînendeyê Saziyên Kurdên Sînornenas Kadar Pîrê derbarê geşedanên li Bakur û Rojhilatên Sûriyeyê de pirsên me bersivandin.*



Gerînendeyê Saziyên Kurdên Sînornenas Kadar Pîrê anî zimên ku ji 50 welatan çete hatine li axa Sûriyeyê bi cih bûne û got: “Çeteyên li Idlibê hêza çekan û lojîstîkê ji Tirkiyeyê digirin û derbasî herêmên din dibin. Li pişt komên çeteyan Tirkiye heye.”

***Ev çeteyên li herême kî ne, ji ku hatine û bi piştgiriya kê van êrîşan pêk tînin?***

Ev çeteyên ku li Idlibê bûn û bi navê Cebet El Nusra tên naskirin û berdewamaEl Qaîdeyê ye. Her demê carekê navê xwe diguherînin. Lê di bingeha xwe de heman çete ne. Piraniya van çeteyan jî ne ji gelên Sûriyeyê ne. uygur, sînnî, turkistanî, ne, ozbek. tacik û şîşan in. Ji hemû welatan hatine. Ji zêdetirî 50 welatan hatine li ser axa Sûriyeyê û di nava çeteyên Eniya El Nûsra de bi cih bûne. Piraniya wan jî berê li Afganîstanî şer kirine. Li gelek cihên din li bin sîwana El Kaîdeyê kirine. Yek ji Serokê wan Ebu Muhammed el-Cevlanî ye. Berê di hepse pergala desthilatdar de bû. Piştî vê meseleya Sûriyeyê, ku em dikarin bibêjin anku Şoreşa Sûriyeyê û Bihara Ereban pergalê ev kes û yên wek wî ji hefsên xwe derxistin û xwestin tevliheviyê bikin. Xwest bibêje ku kes li dijî pergala min tune ye, pergal tenê şerê çeteyan dike.

***Eniya El Nusra hêz û piştgiriya xwe ji kê digire?***

Eniya El Nûsra li Idlibê xwe bi hêz, piştgirî û têkiliyên Dewleta Tirk xwe li ser piyan dihêle. Li dor kampên leşkerên tirkan ên li Idlibê çeteyên Eniya El Nusra hene. Leşkerên tirk wan diparêzin. Lojîstîka xwe bi temamî ji Tirkiyeyê digirin. Hemû rêyên li dora El Nûsrayê girtî ne. Tenê reya Tirkiyeyê li ser wan vekirî ye. Her tişt ji aliyê Tirkiyeyê derbasî aliyê El Nusrayê dibe. Her tişt serbest e. Aliyê leşkerî û ev çeteyên ku berê ji Ewropayê dihatin Tirkiyeyê û diçûn tev li DAIŞê dibûn. Gelek ji wan niha tên Tirkiyeyê û diçin tev li Eniya El Nusra dibin. Hemû di rêya Tirkiyeyê re derbasî nava El Nusra dibin. Ev yek ne angaşt in. Ev hemû li ber çavan e û aşkera ye. Ev hemû bi belge, dîmen û video ne. Tirkiye bi rengekî aşkera piştgiriya wan dike. Tirkiye di civînên Socî û Astanayê de li ser navê wan dan û stendin dikir. Di van civînan de li ser navê wan biryar digirtin. Dîsa çeteyên ku piştgiriya xwe ji Tirkiyeyê digirin Hemzat, Emşat in ku ew jî her rojê navekî li xwe dikin. Xaleke zêde ku mirov balê bikişîne ser, Eniya El Nusra, Heyet Tehrîr El Şam û dîsa kesên li Serêkaniyê navê xwe guhertine li cem tirkan wekî kesên terorîst têne naskirin. Tiştê ku îro bi pêş dikeve wan bi serê xwe ev plan nekiriye. Plan, plana dewleta tirk bû.

***Çima û ji bo çi plana Tirk bû?***

Tirk û rûsan bi hevre ev êrîş plan kirin. Beriya van bûyeran dema liv û tevgerek bi pêş diket, balafirên Rûsyayê leşker, sivîl çete çi dibû dida ber xwe û bombe dikir. Li Idlibê erd dişewitand. Xuya dike ku bi mehan amadekariya vê meseleyê hatiye kirin û destê Rûsyayê jî tê de heye. Çekên nû di destê El Nusra de tune bûn. Ew çek û teknîka niha ne pêkan e ku wan li cem xwe ava kiribe. Ev droneyên ku gihiştine destê El Nusra ji Ukrayna bi riya Tirkiyeyê gihiştin destê wan. Hem jî Tirkiyeyê bi xwe ev çek û drone dane wan. Li ser El Nusrayê di navbera Tirkiye û Rûsyayê de tifaqek heye. Plan û lîstika wan li ser Îranê bû. Dixwestin bi piştgiriya Israîlê hin tiştan bikin. Di meha dawiyê de ji Israîlê bi rêya Tirkieyeyê gelek tişt gihiştin destê El Nusrayê. Plan dikirin ku Îranê bêbandor bikin. Jixwe Esad bêdeng e. Rûsyayê temaşe kir. Niha hinek herêm û qadan topbaran dikin. Lê ev der ne nêzîkî çeteyên girêdayî Hemayê ne. Di hundirê Idlibê de çeteyên ku Rûs dixwazin ji wan xelas bibe tên bombekirin. Mixabin Rûs li Sûriyeyê cara duyemîn hem bêbextiyê li kurdan dikin, hem jî kurdan dixapînin. Rûsya ji bo berjewendiyên xwe têkiliyan bi Tirkiyeyê de bi pêş dike. Rê û deriyê Rûsyayê yê bi cîhanê re tenê tirk in. Ji ber vê yekê Tirkiyeyê jî berjewendiyên xwe dispêre Rûsyayê.

***Hêzên din ên wekî Amerîka û Koalîsyonê çiqas agahdar in?***

Hêzên din wekî Amerîka û hêza koalîsyonê, wan wek terorîst nas dikin. Lê ne wekî xetek sereke ye. Ji ber ku Israîl di nava meseleye de bû Amerîka ji bo wê bêdeng maye. Vê dawiyê hate gotin ku Amerîkayê ji HSDê re gotiye ‘Dûrî vê meseleyê bisekinin. Ev ne şere we ye. Divê hûn xwe dûr bixin.’ Niha piştî vê plana Rûsyayê, hem ji rejîma Sûriyeyê, hem jî ji aliyê tirkan ve gelek çek ketin destê El Nusrayê. Ek Nûsra dikars bi van çek, tang û hêza ku ketiye destê wê şereki mezin li dijî rejîmê pêk bînin. Çekên ku ketine destê El Nusrayê wekî meseleya çekên ku li Mûsilê ketine destê DAIŞê ye. Çawa ku DAIŞ ket Mûsilê û li Mûsilê çek bi dest xistin, niha li Helebê jî heman tiştî xwe dubare kir. Heman çîrokê li Helebê xwe dubare kir.

***Meseleya dalîqandina ala tirkan a li ser keleha Helebê tê çi wateyê? Hûn vê çawa şirove dikin?***

Meseleya ala tirkan a li ser keleha Selehatîn Eyûbî ya Helebê hatiye daliqandin plana Tirkiyeyê ya demdirêj e. Kesên li dor kelehê axivîn, kesên uygur, tacik, tirkmen hemû çeteyên ku ji welatên cîhanê hatine, bang kirin û gotin: ‘Vaye me Heleb rizgar kir.” Kesên wêne û dîmenên xwe li pêş kelehê girtin aşkera gotin: ‘Me Heleb dîsa paş ve stend. Ev der welatê me ye, axa me ye.” Ev yek li ser medyaya tijîtal a Tirkiyeyê jî belav bû. Digotin Heleb bajarê 82an ê Tirkiyeyê ye. Sê rojan ala xwe li rakirin. Gotin Heleb bi Tirkiyeyê ve hatiye girêdan. Gotin Heleb wekî bajar ji Rejîma Sûriyeyê qut kirine û pare jî kirine lîrayê tirkan. Ev projeya Mîsak-î Millî bû. Tirkan digot “Heleb a me bû. Em di Mîsakî Millî de hatin xapandin.” Heta digotin ku “Mûsil û Kerkuk axa me û warê me ye.” Ji xwe serokê MHPê Dewlet Bahçelî jî digot “Heleb Stenbol e. Heleb Enqere ye.” Ev li cem plan û pergala Tirkiyeyê ne tiştekî veşartî ye. Ev plan plana 14 salan e. Ji wezîrê dewletê bigire heta wezîrê şer tev nexşeya ku seranserî xeta sînor di erdnîgariya Tirkiyeyê de nîşan dike, didin pişt xwe.

***Têkiliya çeteyen El Ceyş Vatanî û Tirkiyeyê çiye? Tirkiye planek çawa dike?***

Çeteya El Ceyş Vatanî, bi rastî çeteya Tirkan e. Çekên wan ên Tirkiyeyê ne. Perwerdehiya wan û zimanê wan bi tirkî ye. Daxwazên wan daxwazên Dewleta Tirk in. Wan tu carî berê xwe nedaye rejîmê. Tenê armanca wan jiholêrakirina gelê kurd e. Çima armanca wan li ser Tel Rifhat û Herêma Şehba bû? Ji ber ku dewleta tirkan dixwest plana guhertina demografiyê li vê herêmê têxin meriyetê. Dixwestin vê planê li Efrînê bi ruh bike. Dixwest ji sedî sed têxin kontrola xwe û gelê Efrînê êdî nikaribe vegere ser axa xwe. Nêzî 300 hezar kesan ji xelkê Efrînê koçî kampa Şehbayê kiribûn û li vir bi cih bûbûn. Lê Tirkan ev kamp ji bo xwe wekî kelemekî dît. Her tim ditirsiyan ku rojekê şêniyên Efrînê ku li Şehbayê bi cih bûne dîsa li axa xwe vegerin. Ji ber vê yekê Tirkiyeyê her tim armanc kir ku penaberên Efrînê ku li Şehbayê bi cih bûne dîsa penaber bike û ji cihê wan derxine. Mixabin vê carê daxwaza dewleta tirk bi cih hat. Şêniyên Şehbayê dîsa ji ber êrîşên çeteyên Hemzat û Emşat, koçber bûn. Serokê wan di listeya reş de bû. Hevala me Hevrîn Xelef ji aliyê wî ve hat kuştin. Îspat bû ku di dadgehan de di lîsteya reş de ye. Ev kes li cem Amerîka, Koalîsyon û welatên Ewropa talûke bû. Lê mixabin van bêyî Dewleta Tirk tu tiştî nakin. Li ser berjewendiyên Dewleta Tirk tevdigerin. Bi koçkirina şêniyen Şehbayê daxwaza tirkan pêk hat. Dewleta Tirk her tim vegera gelê Efrînê ji bo xwe talûke dît. Berê 16 welatiyên me li wê herêmê ji aliyê van çeteyan ve hatin serjêkirin. Dîsa gelek welatî li bi destê van çeteyan hatin windakirin. Gelek welatî li Gundê Dêr Cemal ji aliyê van çeteyan ve hatin windakirin. Van çeteyan telefonên welatiyan ji destê wan girtine û bi rêya telefonên wan peyamê ji malbatan re dişînin û gefan li malbatan dixwin. Dibêjin me ew kuştin. Li Efrînê rewşek xerab heye. Bi van kiryarên xwe tirsekê çêdikin ku xelkê Efrînê dîsa li axa xwe û warê xwe venegere. Gelek kes hê li wir winda ne. Me di gelek dîmenan de dît ku van çeteyan çawa êrîşî xelkê me yê Efrîn, Şehba, Şêxmeqsûdê kir.

***Piştî van êrîşan guhertinên çawa li Sûriyeyê bi pêş ketin?***


Piştî van êrîşan hinek guhertin çêbûn. Listîk hat guhertin. Erdogan berê gelek caran tika kir ku Esad li gel wî rûne. Lê îro ji ber rewş hat guhertin, li ser zexta Rûsan Esad dê mecbûr bibe li gel wî rûne. Niha Tirkiye dixwaze rûyê reş ê wan çeteyan spî bike. Wekî ku ev çete hatine guhertin nîşan didin. Wekî ku êdî ne çete ne û ne endamên El Kaîdeyî ne nîşan didin. Lê ew çawa bikin jî bingeh û bîrdoziya van kesan li ser çetebûnê ava bûye. Ji xeynî xwe tu kesî qebûl nakin. Her kesî gawir (nemisilman) dibînin. Ji bo wan kuştina kesên nemisilman jî rewa ye. Li gor wan divê kesên gawir bên kuştin. Lê mixabin îro bi taybet û hemû alem li dijî vê rewşê bêdeng e. Ingîliz van kesan bi kar tînin û dixwazin rûyê wan spî bikin û bêsûc nîşan bidin. Van çeteyan ne tenê li Sûriyeyê li her welatî bi kar tînin. Bi pêşketina van çeteyan zerarek pir mezin li gelê Sûriyeyê bû. Me digot çareseriya Sûriyeyê nêzîk bûye. Lê xuya dike ku em dîsa li 10 salên berê vegeriyan. Dîsa mirov ji ber nasnameya xwe tên kuştin. Me wekî kurd, Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û Sûriyeya Demokratîk xwe ji wan parast. Lê mixabin vê carê parastina me koçkirina miletê me bû. Ji bo parastinê miletê hem ji Helebê û hem jî ji Şehbayê koç kir. Zerarek mezin çêbû. Ji bo parastinê bedelek mezin dan. Ji bo em bi xizara herî kêm miletê xwe biparêzin me cihê miletê xwe guhert.

***Hûn hêza parastinê ji ku digirin?***

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) 14 salan heta astekê ev milet parast. Heta astekê gel parast. Hê gelek kes şaş dimînin û dibêjin “Van çawa dikaribûn şerê DAIŞê bikin. Çawa dikaribûn xwe biparêzin û saziyên xwe ava bikin. Çawa dikaribûn DAIŞê tune bikin.” Lê em xwedî fikr û bawerî ne. Xelasiya gelê Sûriyeyê bi projeya Sûriyeya Demokratîk, Neteweya Demokratîk û Xweseriya Demokratîk e. Em bang dikin ku divê ji aliyê dan û stendinê ve, ji aliyê dialogê ve xeta sor li cem me tune be. Divê em hesasiyeta gelan li ber çavan bigirin û li gor wê tev bigerin. Divê bi her kesî re dan û stendin hebe. Divê em li ser esasê parastina gelê xwe tev bigerin û me karibin bi her kesî re dan û stendinê bikin. Di çend rojên dawî de gelek tişt hatin guhertin. Plan hê gelek zelal nebûye.. Baweriya me bi hêz û siyesatetmedarê me xurt e. Baweriya me bi fikra me zêde ye. Em bawer in dê ji bo gelê kurd û gelên li Sûriyeyê dê encamek baş pêk bê.

# Di wêjeya kurdî de bandora Erebê Şemo

Erebê Şemo (1897-1978) nivîskarekî pêşeng e ku yekem romana kurdî nivîsandiye, bi berhemên xwe yên wêjeyî çanda kurdî zindî kiriye û li Yekîtiya Sovyetê piştgirî daye nasnameya kurdî



Arslan Ozdemir

“Gelê ku zimanê xwe diparêze di rê de bi pêş dikeve; yên dinivîsin vê nasnameyê didin jiyandin.”

Mîrateya ku Erebê Şemo di warê wêje, çand û nasnameyê de hişt, bi taybetî di nîveka sedsala 20. de di civaka kurd de bandorên sosyolojîk ên kûr afirandin.

Erebê Şemo li Qefqasyayê ji dayik bûye, li diyasporaya Kurdên Yekîtiya Sovyetê mezin bûye û li wir xebatên xwe yên wêjeyî berdewam kiriye. Şemo, ku firsendên pergala Sovyetê ji bo xurtkirin û pêşxistina çanda kurdî bi kar anî, bi romana xwe ya bi navê ‘Şivanê Kurmanca’ ku di sala 1935an de nivîsîbû, nûbûn anî ser wêjeya kurdî. Di romanê de jiyana civakî ya gelê kurd û zehmetiyên civaka kurd bi awayekî realîst vedibêje. Ev berhem ji ber ku di romannivîsîna kurdî de yekemîn e di wêjeya kurdî de xaleke werçerxê ye.

Di berhemên Şemo yên wêjeyî de têgihiştineke cuda ya realîzma civakî tê dîtin. Di berhemên xwe de mijarên wekî neheqiyên civakî, newekhevî û têkoşîna gelan radixe ber çavan. Berhemên Şemo bi vegotina lêgerîna nasnameya civaka kurd û têkoşîna azadiyê re hişmendiya civakî diafirîne. Berhemên wî yên ku li bin bandora tevgera sosyal realîzma Sovyetê de bi armanca ronîkirina pirsgirêkên civakê hatine nivîsandin, hem li ser nasnameya kurdî û hem jî bi dînamîkên civakî yên civakê ve mijûl dibe. Ev aliyê Şemo di çarçoveya Yekîtiya Sovyetê de risteke girîng di pêşxistina hişmendiya çanda kurdî de lîst.



Şemo bîrdoziya Sovyetê pejirand û hewl da ku nasnameya kurd û Sovyetê bigihîne hev. Di vî warî de, Şemo bi yekkirina nasnameya kurdî bi polîtîkayên çandî yên Sovyetê re, hem çanda kurdî zindî hişt û hem jî hewl da ku nasnameya kurdî ya girêdayî dewleta Sovyetê ava bike. Şemo, ku piştgirî da xebatên parastina ziman û çanda kurdî li Yekîtiya Sovyêtê, bi taybetî jî bi piştgiriya fermî alîkarî da pêşdebirina ziman û wêjeya kurdî. Vê rewşê hişt ku çanda kurdî di nav sînorên Yekîtiya Sovyetê de jî bimîne û bû alîkar ku nasnameya kurdî bê parastin.

Berhemên Şemo di çanda kurdî de şiyarbûneke civakî û wêjeyî nîşan didin. Şemo ku bi wêjeyê nasnameya kurdî hembêz kir û li ser pirsgirêkên civakî rawestiya, di berhemên xwe de kêşe, hêviyên gel û lêgerîna azadiyê, di civaka kurd de hişmendiya nasnameyê afirand. Berhemên Şemo yên wêjeyî ji bo ciwanên kurd, ji bo mayîndebûna ziman û çanda kurdî bûne cihê îlhamê. Dema ku bandora sosyolojîk a li ser civaka kurd ji vî alî ve bê lêkolandin, bandora berhemên Şemo li ser nasnameya kurdî diyar dibe.

Erebê Şemo wekî pêşengekî wêjeya kurdî, bandoreke mayînde li ser nasname, çand û zimanê kurdî kiriye. Berhemên wî di civaka kurd de hem bûne sedema şiyarbûneke çandî û hem jî sosyolojîk. Wateya sosyolojîk a berhemên Şemo di têkoşîna civaka Kurd a ji bo nasname û azadiyê de, di pêşketina wêje û çanda kurdî de risteke sereke dilîze.

***Çavkanî:***

***1-*** Bozarslan, H. (2003). Neteweperestiya Kurd û Tevgera Kurd. (Neteweperweriya kurd û pêşketina wê ya dîrokî.

***2-*** Şemo, E. (1935). Şivanê Kurmanc. (Yekemîn romana edebiyata kurdî.)

***3-*** Hesenpûr, A. (1992). Neteweperwerî û Ziman li Kurdistanê, 1918-1985. (Rista wêjeyê di parastina ziman û çanda kurdî de.)

***4-*** Saadî, A. (2000). *Siyaseta Wêje û Çanda Kurdî ya Sovyetê*. (Lêkolîna çandî li ser kurdên Sovyetê.)

# Gerdûna min

Birîndarê Çavrê

Ji tênegihaştina me ya civakî
Me dan ber pêlên başewateke nediyar
Û me bi sê aliyê rojhilatê bakur ve dan dirûtin
Ew nediyarên ku ji bo windahiyên me
Qewl dabûn jor û jêr!

Em ji hev bê hay
Vexwarina me Berxwedana hilma gerdûnê
Xwarina me sebra axê bû!

Ji bo şadbûyîna xweziyên xwe
Me çend pelên payîzan weşand sebra axê
Ji guliyên xwe,
Hîvê biskên xwe berdan demsalan
Tavê keziyên xwe
Û du canî man çar demsal,
Di hemla xwe de da ajdan
Sebra axê
Şabûnên xweziyên me yên hêvîbar!

Me hewl da ku xwe veguherînin kulîlkên me
Û em fêkiyên xwe bixwin
Ji guliyên hevûdin

Nizanim, lê
Ji bo jêbirina jiyanameya ya pev re
Xwe dan herikandin
Hêzên tarî
Bi ser jiyana me ve
Mîna taviya zîpikê!

Bê ew jiyana min û te ya bêdil,
Nizanim, lê,
Ji bo ku tu min dûr bixî jixwe
Û xwe jî bi min bidî windakirin
Te dojeh bi me da vexwarin

Wê kêliyê sotik qerisî
Ji bisk û keziyên hîv û tavê mehwa daket
Û şibiyam giyayê rêsandî!

Li bin baskên bircên Ameda
Ku ji hişê amediyan dihat jibîrkirin
Ez û şev bûn mêvanê şopên me
Yên qirna bîst û yekemîn
Ji paxila sê nifşên perwaz terên bêlîsik

Ji nişka ve bayekî qerisî
Li nava xwe lefand keziyên hîvê
Û xist bin çermê berazên kedîkirî!

Di demsala hejandî de avis man
Pênc lebatên min ên stewr
Û bedena min  bû sindoqa lebatên xwe!

Tu staran gazî min û şevê nekir wê şevê
Ji bilî kevokên min ên perqusandî
Hingê ez şibiyam berdîneyê bêkêr!

Di demeke bêwext
A bêhal û bêxew de,
Di nav ramanên xwe de gevizîm
Bi govantiya şevê,
Tavê dîl girt
Şeva ku di çenga min de
Xwe ji min re kiribû cangorî!



Ne bi hêviyên bikul û birîn,
Ne bi hêviyên nexweş û mirî,
Bi hêviyên têgihiştî
Min li xwe fesiland kirasê payîzê
Ji bo ku te ji nû ve bibînim
Û ji bo domandina xwarina fêkiyên me
Min qewirandin Ew nîgaşên ku bêhn li min didan çikandin!

Min sazûmaniya gerdûna xwe
Di kirasê payîzê de dît
Gerdûna di nav penc û nikûlên dagirkerê laşxûr de

Hebûna min
a ji tunebûnê
Û tunebûna min a ji hebûna min afiriye
Hêj mîna hevîrê nehatiye gilokkirin yekparçe!

Têgihiştim ku
Me ji zimanê sazûmana gerdûna xwe fam nekiriye!

Heta ku te nebînin hinav û dil
Ji bo têgihiştina çav û hiş, nîgaş û xewnê
Dê payîzê bijî ev gerdûna min!



Xweşkanî
Felemez Ulug

# Civaka ku li ser hîmê xwe şîn dibe

**Welatên hegemon ên ku siyaseta wan a li herêmê xitimiye, weke ku pêşdidîtin nikarin pêş ve biçin. Lewma bi armanca bikaribin li herêmê ji bo xwe qadên nû vekin dixwazin kaosê derxin. Ev ji despêkê ve yek ji stratejiya herî bingehîn a hêzên hegemon e**

Bi êrişên li ser Helebê re li Sûriyeyê pêvajoyeke nû hate destpêkirin. Wisa diyar e ku ev pêvajoya bi perspektîfa NATOyê bi pêş dikeve dê hevsengiyên li herêmê serûbin bike. Di vir de hêzên li ser dînamîkên xwe yên bingehîn disekinin dikarin xwe li ser piyan bigirin û hebûna xwe bidomînin.

Bi hegemonyaya Amarîka û Yekîtiya Ewropayê şerên nû yên li Rojhilata Navîn tên meşandin. Gelo ev şer ê zêdetir bibin? Bi van şeran re hêzên hegemon li herêmê çi dikin armanc? Aşkera ye ku mirov nikare bersivên zelal bide van pirsên bingehîn ku qedera herêmê diyar dikin. Lê tişta aşkera û diyar ew e ku mirov nikare geşedanên ku niha li herêmê diqewimin ji bûyerên di nava van sed salên dawî de qewimîne cûdatir binirxîne.

Beriya her tiştî em dikarin bibêjin ku şansê serketinê yê projeyên hêzên hegemon ên ku li ser îradeya gelên herêmê tên ferz dikin nîn e. Dewletên ku piştî şerê cîhanê yê yekemîn li dijî îradeya gelan nexşeyên nû xêz kirin û li bin navê netewe-dewletan hebûna xwe li ser gelan ferz kirin, niha jî dixwazin bi vî şerî wesayeta stratejiyeke nû bi pêş bixin. Ji bo vê armanca xwe jî, bi taybetî li Rojhilata Navîn bi pergalên totalîter re di nava hevkariyeke mezin de xebat û hevkariyê bi pêş dixin. Lê divê bê zanîn ku heta mêjiyê netewe-dewletê ji holê neyê rakirin tu proje nikarin Rojhilata Navîn ji tengavî derxînin û pirsgirêkên heyî çareser bikin. Ji ber vê yekê hem Yekîtiya Ereban hem jî Rêxistina Konferansa Îslamî ji ber ku xwe dispêrin mêjiyê netewe-dewletê di çareseriya tu pirsgirêkan de nikarin bibin xwedî risteke bingehîn.



Bi şerê ku di 17ê kanûna 2010an de, bi çalakiya ciwanekî Tûnisî ku li dijî zordariya hikumetê xwe şewitand dest pê kiribû veguherî serhildanên gel û bi navê Bihara Ereban hevsengiyên herêmê hatin guhertin. Herçendî qeyranên aborî û civakî weke sedemên bingehîn ên vê serhildana gel tên dîtin jî, di bin de sedem û hêmanên siyasî û îdarî rê li ber vê serhildana mafdar vekirin.

Hêzên hegemon ev serhildanên gel ên mafdar ji bo berjewendiyên xwe weke fersendek dîtin û bi destê komên çete mudaxeleyî herêmê kirin. Di vê çarçoveyê de bi taybet ji sala 2011an vir ve Rojhilata Navîn kirin gola xwînê. Şer û pevçûnên bi peymanên navneteweyî di sala 2020an de kêm bûbûn, di 27ê mijdarê de bi êrişa çeteyên Heyet Tehrîr El Şamê ya li dijî Helebê ji nû ve dest pê kir.

Bi van êrişên nû re hevsengiya li herêmê serûbin bû. Dewleta Tirk a dagirker bi armanca ku dagirkeriya xwe li herêmê berfireh bike ev êriş bi kar anîn. Komên çete yên ku ji welatên Qefqasya berhev kirine li bin navê cûda li herêmê xist tevgerê. Ev çeteyên ku nesîbê xwe ji exlaq û mirovahiyê negirtine, li gor çanda hovîtiyê ya ji Pan-Tirkîzmê digirin tevdigerin û li herêmê komkujiyan pêk tînin. Li dijî van komkujî, revandin, kuştin, talan û hilweşîna mezin dewletên qaşo bahsa mafên mirovan dikin bêdeng dimînin. Pir aşkere ye ku bêdengiya wan a li dijî van sûcên şer şirîkatiya wan a bi vê hovîtiyê re aşkera dike.

Bi êrişên li ser Efrîn û dagirkirina wê re bi deh-hezaran kes bûn koçber û di bin şertên pir zahmet de li herêmên Til Rifat û Şehbayê di kampan de hewildidan jiyana xwe bidomînin. Bi êrişa li ser Helebê re dewleta Tirk a dagirker di gava ewil de berê xwe da vî gelî. Armanc ji dagirkeriyê wêdetir komkujî bû. Bê gûman ev ne projeya Dewleta Tirk bi tenê bû, hêzên navneteweyî jî li pişt perdê ev plan erêkiribûn. Lewma li hemberî pêşveçûna çeteyên hov ên Dewleta Tirk a dagirker xwe ker, lal û kor kirin. Ji nedîtinê ve hatin...

Li hemberî vê durûtiyê di serî de Rêveberiya Xweser û hêzên wê yên parastinê ji bo xelkê herêmê derbasî cihekî bi ewle bikin xebitîn. Ji bo parastina gel banga seferberiyê hate kirin. Divê ev banga girîng ji gelek milan ve were nirxandin. Seferberiya parastina ax, civak, hebûn welatê xwe ye. Ji bo pêşwazîkirina koçberên derbarsî herêmên Rêveberiya Xweser dibin banga alîkariyê li her kesî hate kirin. Kurd û dostên wan ên li derveyî welat jî divê weke xelkê herêmê bi rihê seferberiyê rabin û têkevin tevgerê. Bi yekgirtin û piştevaniyê pêkhateyên herêmê dikarin van planên qirkirinê ên li ser wan tên ferzkirin vala derxin.

Dewletên hegemon bi armanca siyaseta Rêveberiya xweser ya li ser xeta sêyemîn pêşdikeve lewaz bikin û bikaribin wê bikşînin xeta xwe şer li ser ferzdikin. Ji ber vê siyaseta şerxwazî, talan û qirkirinên pêkhateyên herême tevî derfetên kêm jî xwedî li hebûn û îradeya xwe derdikeve. Li hemberî van êrişên ku hebûna Rêveberiya Xweser û destkeftiyên gelê herêmê dike hedef gel bi perspektîfa Şerê Gel ê Şoreşgerî xwe bi rêxistin dike û li seranserî herêmê xeta xweparastinê daye avakirin.

Welatên hegemon ên ku siyaseta wan a li herêmê xitimiye, weke ku pêşdidîtin nikarin pêş ve biçin. Lewma bi armanca bikaribin li herêmê ji bo xwe qadên nû vekin dixwazin kaosê derxin. Ev ji despêkê ve yek ji stratejiya herî bingehîn a hêzên hegemon e. Bi siyaseta perçe bike û bi rêve bibe hebûna gelan tê înkar kirin û deverên wan pêşkeşî komên çete têne kirin. Bi taybet Dewleta Tirk a dagirker jî di çarçoveya vê siyaseta pûç de ji bo êrişî herêmên Rêveberiya Xweser bike her roj bi rê û rêbazên cûda xwe li ser van hêzan ferz dike. Ji bo vê jî hem bandora xwe ya li ser komên çete û koçberên bi darê zorê ji warê xwe hatine durxistin weke şantejekê bi kar tîne.

Bêgûman weke ku me li jor jî got; mirov dikare şerê ku li herêmê diqewime di çarçoveya jinûvesazkirina herêmê binirxîne. Lê rewşa reel a ku li herêmê derdikeve pêş ew e ku siyaset û planên ku ji aliyên gelên herêmê ve neyên qebûlkirin ne mumkun e ku bigihin serketinê. Dibe ku ji bo demeke kurt hinek tiştan bide bidestxistin lê ev siyaset ji bo demeke dirêj mehkûmî windahiyên mezin e. Ji 2010an û vir ve siyaseta ku li ser gelên herêmê tê ferzkirin ji ber ku bi berjewendî, çand û hebûna gelên herêmê re nabe yek bi ser nakeve.

Li dijî van êriş û siyaseta tunehesibandinê, gelên herêmê di çarçoveya paradîgmaya neteweya demokratîk de xwedî li hebûna xwe derdikevin. Ez di wê baweriyê de me ku ji bo qeyrana ku hêzên hegemon behsa wê dikin ji holê bê rakirin riya herî guncav û ku dikare bi karektera civaka herêmê re jî bibe yek pergala neteweya demokratîk e. Ji ber ku di van 100 salên derbasbûyî de me dît ku tevî ewqas êş û şeran jî tu pergal ji pêdivîyên civaka Rojhilata Navîn re nebûn bersiv. Lewma li gel şer û pevçûnan yek ji pirsgirêka herî bingehîn a herêmê jî pergala ku li ser tê ferzkirin e.



Hisên Çatikkaş

# Parastina Rojava Ferz e!



Di vê pêvajoya şerê dinyayê yê sêyemîn de armanca dagirkerên Kurdistanê dîsa bêstatuhiştina kurd û Kurdistanê ye. Lewra li gelek deveran tên gel hev û li dijî desketiyên kurdan proje û polîtîkayên nû saz dikin. Bêguman pêşengiya vê yekê jî Dewleta Tirk dike. Di avakirina pergala nû ya dinyayê de tu rist û mîsyona Dewleta Tirk nemabû, hêzên navneteweyî Dewleta Tirk derveyî avakirina pergala nû hiştibûn. Bi taybetî li gel şerê di navbera Îsraîl û Hamasê de Dewleta Tirk bi temamî derveyî vê projeya nû mabû. Rist û mîsyona Îsraîlê li Rojhilata Navîn zêdetir bû û herwiha bala hemû dewletan çû ser vî şerê di nabera Îsraîl û Hamasê de. Dewleta Tirk jî ji vê yekê sûd wergirt û çeteyên bermayiyên DAIŞê komî ser hev kirin, çek û cebilxane dan van çeteyan û berê wan da Helebê.

Herçendî wekî navenda şer Heleb û bajarên di destê pergala Esad de be jî, Dewleta Tirk di heman demê de berê çeteyan daye destketiyên kurdan. Çeteyên ku bermayiyên DAIŞê ne li gelek deveran êrîş birin ser herêmên rojavayê Kurdistanê. Dîsa ji van deveran dîmenên serjêkirin, qetilkirin û êşkencekirina sivîlan ên çeteyên Dewleta Tirk belav dikin. Wekî ku DAIŞê bi dîmênên bi vî rengî tirs û xof xist nava civakê, bi heman awayî ev çete jî bi van dîmenan dixwazin tirs û xofê bixin nav civakê, da ku van deveran dagir bikin. Bêguman ev ne tenê şerê Dewleta Tirk e, anku ev şerê ku niha li Rojhilata Navîn tê meşandin di bin kontrola hêzên navneteweyî de ye û li gor proje û planên van hêzên navnetewî ye. Lewra ev hêzên navneteweyî li dijî van dîmenan bêdeng, ker û kor in. Dewleta Tirk jî dixwaze van hêzan para xwe bigire û dixwaze bibe xwedî rist û mîsyon di sazkirina vê pergala nû de. Ji ber vê yekê piştgiriya xwe ya ji van çeteyan re bi awayekî aşkera û zelal didomîne. Çete jî her devera ku dikevinê ala tirkan bilind dikin.

Dewleta Tirk û çeteyên ku bermayiyên DAIŞê ne berê xwe dane Rojava. Ji bo ku hemû desketiyên kurdan ji holê rakin. Jixwe her tim Dewleta Tirk bi hincetên nû mal û milkê kurdan dide ber tank û topan. Bêguman li Rojhilata Navîn konsepteke nû ya hêzên navneteweyî tê meşandin. Ev konsept li ser qeyran, alozî û şeran tê avakirin. Li devera şer û aloziyê hebin, tirs, hejarî û penaberî jî heye. Heta çavbirçîtiya dewletên herêmê hebe hêzên navneteweyî jî dê ji bo bi pêşxistina konsepta xwe ya nû li Rojhilata Navîn şer, pevçûn û aloziyan bidomin. Ji ber ku dagirkerên Kurdistanê jî hemû polîtîkayên xwe li ser tunekirina nasnameya kurdan ava kirine, zû dikevin xefka hêzên navneteweyî.

Heta dagirkerên Kurdistanê van polîtîkayên xwe bernedin, hebûn û nasnameya kurdan nas nekin ev şer û aloziyê li van welatan xilas nabin. Li ser meseleyê li deverekî dema agir kêm dibe, benzînê diavêjin li agirê devera din. Piştî agirbesta li Lubnanê niha dîsa berê şer dan Sûriyeyê. Şer li Sûriye û rojavayê Kurdistanê gur kirin. Çeteyên li van deran şer dikin di bin kontrola Dewleta Tirk de ne û Dewleta Tirk jî li gor konsepta hêzên navneteweyî tevdigere û li gor konsepta van hêzan çeteyên xwe bi kar tîne. Dema ku ev hêz dibêjin êrîş bikin, ev çete êrîş dikin û hovîtiya xwe bi pêş dixin, lêbelê dema ku ev hêz dibêjin rawestin bêguman dîsa radiwestin. Bêguman

Niha Dewleta Tirk û pergala wê AKP û MHP ji bo ku bibe xwedî rol û mîsyon van çeteyan li gor berjewendiyên xwe û konsepta nû bi kar tîne. Danûstandin û hevdîtinên pir balkêş di vê meha borî de di navbera rejîma Dewleta Tirk û hêzên navneteweyî de pêk hatin. Di encama van hevdîtin û danûstandinan de desthilatdariya AKP û MHPê çeteyên xwe yên cihadîst seferber kirin. Çeteyên ji hêla lojîstîk û istixbarî ve piştgiriyê ji Dewleta Tirk digirin di demeke nêzîk de Heleb ji pergala Sûriyeyê standin û xistin bin kontrola xwe. Herwiha çeteyan ji gelek deveran ve êrîşê Rojava kirin.

Dîsa koçberî, xwîn û mirin bû para kurdan. Bi sedan sal in ku dewletên dagirker kurdan bi darê zorê koçber dikin û dikujin. Dîroka dagirkeran tijî qirkirin in. Dîroka xwe bi qirkirinên li ser kurdan xemilandine û her tim xwestine ku demografiyaya Kurdistanê biguherînin. Ji bo vê jî projeya Dewleta Tirk ew ku kurdan ji Rojavayê Kurdistanê derxîne û li şûna kurdan jî çeteyên xwe û malbatên wan bi cih bike. Lê çawa ku bi talankirina Dersîmê, Dersîm nebû bajarê tirkan û çawa ku bi Kemera Ereban Rojava nebû warê ereban, bi van projeyên wan ên nû jî welatê kurdan Kurdistan ji wan re nabe war. Kurt û kurmancî çawa ku heta niha bi ser neketine û dê ji niha şûn ve jî bi ser nekevin. Ji ber ku her bihosteke axa Kurdistanê bi xwîna kurdan hatiye avdan. Lewra heta niha ne dagirkeran kurd qedandin ne jî dê bermayiyên wan ji niha û pê ve bikaribin kurdan biqedînin.

Armanca sereke ya Dewleta Tirk tunekirina desketiyên kurdan e. Li ku derê desketiyên kurdan hebin dixwazin wan desketiyan bifetisînin. Lewra ewilî bi destên DAIŞê xwestin desketiyên kurdan tune bikin û kurdan ji Rojava û Başûr derînin. Lêbelê ev projeya wan rastî berxwedana jin û xortên kurd hat. Herwiha hiş û bîra cihadîstan jî li ser koletiya jinan hatiye avakirin. Lewra li ku derê desketiyên jinan hebin ewilî êrişê wê derê dikin. Çawa ku bi qeyûman li bakurê Kurdistanê dixwazin desketiyên jinan tune bikin, li rojavayê Kurdistanê jî bi destên cihadîstên xwe dixwazin desketiyên jinan tune bikin. Lê çawa ku DAIŞê nekarî vê yekê pêk bîne bermayiyên DAIŞê jî dê nikaribin pêk bînin.

Helbet ji bo parastina destketiyên kurdan ruh, berxwedan û yekitiya kurdan a li dijî DAIŞê pêwîst e. Heke ku kurd li dijî bermayiyên DAIŞê li her derê rabin ser xwe û çi ji kê tê texsîr nekin, dê encam dîsa berxwedaneke birûmet û heybet be. Ji bo berxwedaneke birûmet jî parastina Rojava li ser me hemû kurdan ferz e.

Parastina Rojava valaderxistina plan û projeyên dewletên dagirker û hêzên navneteweyî ne. Parastina Rojava pêşîlêgirtina qirkirin, tacîz, destdirêjî û revandina mirovan e. Anku parastina Rojava parastina hemû nirxên mirovahiyê ye. Di heman demê de parastina Rojava parastina 'jin jiyan azadî', jiyaneke wekhev, adil, ekolojîk û demokratîk e.

Herwiha parastina Rojava parastina yekitiya kurdan e. Ji ber ku cara yekem kurdan li ser Rojava li hev kir û herwiha bi hev re Rojava azad kirin.

Herî dawî parastina Rojava parastina cangoriyên li her çar milên Kurdistan û dinyayê ye ku Rojava bi xwîna xwe av dan û ji me re hiştin. Divê em jî xwedî li mîrateya wan cangoriyan derkevin, ji ber ku parastina Rojava xwedîderketina van cangoriyan e.

***Ev dem dema***
***PARASTINA ROJAVA ye...***

# Vê carê planên wan bi ser nakevin

Dibêjin ku bila hêzên çekdar vekişin lê gel bimîne. Bila hêza parastinê tune be lê bila jin û zarok bimînin. Heke çekên we tune bin, hûn xwişk û birayên me ne. Heke çekên we hebin, hûn dijminê me ne. Wisa nabe

Zinar Ronî

Çeteyên di bin kontrola Tirkiyeyê de bangewazî li HSDê û hêzên kurd kirine. Bi kurtasî wiha dibêjin: “Em li dijî Esad şer dikin… Em fersendekê didin we, tevî çekên xwe ji Helebê derkevin û derbasî herêmên xweser bibin… Em kurdan wekî perçeyekî ji Suriyeyê dibînin. Kurd jî xwedî heman mafên wekhev in… Parastina we û pêkanîna mafê jiyaneke birûmet peywira me ye…”

Hê di ser van gotinan de demek dirêj neborî nûçe û dîmenên ku çete êrîşî sivîlan dikin belav bûn. Dev ji parastinê berdin, riya otobûsên ku hewl didan sivîlan veguhezînin heremên ewle girtin. Gel bi derfetên xwe dev ji cih û warê xwe berda. Gelê Efrînê ku carekê ji cihê xwe bûyî careke din kete ser riyan û koçber bû. Mirov ji bo ku nekevin destên çeteyan dawî li jiyana xwe tînin.

Di van demên dawî de du nûçeyan gelek bala min kişand. Yek jê nûçeya li ser Evdirehman Xelîl Murşîd bû. Murşîd yek ji avakerê Partiya Tifaqa Demokratîk û Neteweyî ya Suriyê bû. Murşîd ji ber dagirkirina Efrînê derbasî Şehbayê bûbû û têkoşîna xwe li wir didomand. Dema ku çete di 2yê Berfanbarê de êrîşî Şehbayê dikin heya dawî di xeta parastinê de cih digire. Heya dawiyê li ber xwe dide. Piştre dibêje cihê ku ez ê radest bibim ez ê dawî li jiyana xwe bînim. Û xwe feda dike. Nûçeyeke din jî di derbarê kesên ku derbasî herêmên xweser dibin de bû. Gel tiştên xwe li traktoran bar dikir. Di maşîneyekê de zarokekî biçûk, qey sê salî hebû, serê xwe di şibakê de derxistibû û bi tiliyên xwe remza serkeftinê nîşan dida. Di ewqas şert û mercên zehmet de zarokekî biçûk tiliyên xwe radike. Ev jî nîşan dide ku gelê kurd çiqas birêxistin bûye, çiqas ji xwe bawer e.



Em bên ser mijara bangewaziya çeteyan. Dibêjin ku bila hêzên çekdar vekişin lê gel bimîne. Bila hêza parastinê tune be lê bila jin û zarok bimînin. Heke çekên we hebin hûn hevalê Amerîka û Îsraîlê ne, kafir in. Heke çekên we tune bin, hûn xwişk û birayên me ne. Heke çekên we hebin, hûn dijminê me ne, heke tune bin cihê we li ser serê me ye. Ev bangewazî ne xerîb e. Bi salan e Dewleta Tirk jî heman tiştî dibêje. Dewlet Bahçelî, berî ku çete bangewazî bikin di meclîsa Tirkiyeyê de heman tişt anî zimên. Got ku “Kurd xwişk û birayên me ne, lê divê nebêjin em kurd in.” Çete jî heman tiştan dibêjin. Jixwe xwedî çi bibêje xulam jî heman tiştî dibêje. Xuya ye Tirkiyeyê ew baş hînî siyaseta xwe kirine. Rê û rêbaza ku ew dişopînin, fêrî çeteyan jî kirine.

Helbet dibe ku çete bangewazî bikin, dibe behsa gelek tiştên xweş jî bikin. Lê ew çi bibêjin jî rastiya wan li holê ye. Ew kurdên birêxistin naxwazin. Dixwazin kurd di bin serweriya wan bin, ew çi bibêjin kurd li gor wan biçin. Kurdên biçek, tê wateya kurdên bîîrade. Ew jî vê naxwazin. Dema ku çeka kurdan hebe, nikarin kurdan bişêlihînin, nikarin dest deynin ser keç û xortên wan, nikarin miameleya koleyan li wan bikin. Lewma dibêjin bila yên çekdar biçin ên din bimînin. Siyaseta qirêj dimeşînin. Tirkiye jî nabêje ez li dijî hemû kurdan im. Dibêje ez li dijî ‘kurdên terorîst’ im. Di çavê dewletên dagirker de kurdên ku mafên xwe dixwazin, dixwazin wekî xwe bijîn ‘terorîst’ in. Çete jî heman tiştî dibêjin.

Çeteyan li gor xwe hinek plan çêkirine. Aqilmendê wan Dewleta Tirk û Erdogan e. Erdogan berê DAIŞê da Kobanê, xwest Kobanê dagir bike, lê nebû. Kobanê neket lê desthilata Erdogan ji wê rojê heta niha di nav qeyranê de ye. Dijberiya kurdan Dewleta Tirk xistiye nav qeyranê. Ji ber ku Kobanê neket, Erdogan her tim li pey tolhilanînê ye. Niha jî berê çeteyan careke din da herêmên xweser. Ji Şehba û Til Rifatê bi deh hezaran kes tên veguhestin. Rêveberiya Xweser û QSDê ji bo zirar negihije sivîlan hêza xwe dan veguhestina sivîlan. Dibe ku ji bo Dewleta Tirk û çeteyan sivîl ne girîng bin lê ji bo rêveberiya xweser tişta herî girîng saxiya sivîlan e. Di fîlmekî de bûyerek derbas dibû. Sivîl ji bo şer dibûn bargiranî. Fermandar biryar dida ku sivîlan veguhezin cihê ewle. Fermandarekî jî gilî û gazinc dikir ku parastina sivîlan hêza wan biçûk dike û nikarin şer bikin. Lê Fermandarê giştî digot: “Heke sivîl tune bin tu wateya şerê me tune.” Rêveberiya xweser jî bi vê felsefeyê tevdigere û tevdîran digire.

Xetereya li ser gel hê jî didome. Herî dawî niştecihên taxa Şêx Maqsud û Eşrefiyeyê biryar dan ku ew ê heta dawiyê xwe biparêzin. Rêveberiya xweser jî hewl dide korîdorekê di navbera Heleb û herêmên xweser de veke. Kurdan û dostên wan ji bûyerên berê gelek tecrube girtin. Lewma bi baldarî tevdigerin. Wisa xuya dike ku li gor rêza tiştên girîng û girîngtir tevdigerin. Dibe ku hinek bibêjin nikarin şer bikin. Lê di rastiyê de mesele ne şerkirin e. Mesele şerkirineke çawa ye. QSD û rêveberiya xweser di her daxuyaniyên xwe de hem bangewaziya diyalogê kirin hem jî anîn zimên ku di her şert û mercî de ew ê gel biparêzin. Planên çeteyan wekî berê nagihijin encamê.

Tiştekî din ê ku bala min kişand jî daxuyaniyên hatin dayîn bûn. Dezgeh û saziyên rêveberiya xweser bi awayekî koordîne daxuyanî dan. Bêyî ku hevdû vala derbixin, di her mijarê de muxatabên wê daxuyanî û bangewazî kirin. Ev jî nîşan dide ku rêveberiya xweser gihiştiye astekê. Helbet xeterî mezin e. Wisa xuya dike ku şer ê gurtir bibe. Lê rewşa niha ne wekî berê ye. Dibe ku hişmendî û armanc neguherî be lê pozîsyona aktoran ne wekî berê ye. Hêzên ku berî niha têk çûn ê carek din têk biçin.

# Aştî an radestî?

Cahît Kirkazak

Dema di yekê cotmeha du hezar û bîst û çaran da serokê MHPê Bahçelî serî li koma DEM Partiye xist di nava gel de tevgerek çêbû. Ji her seriyekî dengekî cuda derdiket. ‘Gelo pêvajoyekî nû dest pê dike.’ ‘Dewlet bi birêz Abdulah Ocalan re li hev hatiye, lê rêxistina wî astengî derdixe’, ‘tevgera siyasiya Kurd hevdîtinên pişt derî pek tînin’ û hwd. Ji ber ku gotinên Bahçelî ên ku derdiketin manşetê gelek balkêş, bi îdîa û di astên jor de bûn. Heger mirov tenê li gotinên Bahçelî yên li manşetê binêre dê şaş be. Ji ber ku Bahçelî di hurgilîya axaftina xwe de tiştê ku behs dikir ne ji bo aştiyê bûn, ji bo rasdestgirina kurdan bû.

Ger ku daxwaz û armanca Bahçelî aştî be rê diyarce û rê vekiriye. Birêz Abdulah Ocalan jî amade ye. Gelê kurd bi salan e bi dengekî bilind û zelal dibeje ku Abdullah Ocalan vîna aştî û çareserîyê ye. Dewlet jî vê rastiya a Abdullah Ocalan dîtiye û baş dizane. Ji 1993an heta îro çi wextî dewlet bi Ocalan re ketibe têkîliyê û dîyalogê dengê çekan qut bûye hêviya aştiyê şîn bûye. Birêz Ocalan di peyama xwe ya Tebaxa 2019an de got ku ‘Ez dibêjim ez dikarim di hefteyekê de rewş û îxtimala pevçûnê ji holê rakim. Ez dikarim çareser bikim, ez bi xwe bawer im, ez ji bo çareseriyê amade me. Lê divê hem dewlet û hem jî mejiyê dewletê tişta pêwîst bike.’ helwesta xwe ya aşitiyane îlan kir. Birêz Ocalan bi vê helwesta xwe, dewletê jî vedixwend aştiyê. Ocalan helwesta



xwe ya aşitiyanê di Cotmeha du hezar û bîst û çaran da jî dubare kir. Di 23 ya Cotmeha 2024an de di hevdîtina birarziyê xwe de ku di heman demê de parlementerê DEM Partîyê Omer Ocalan, peyama xwe a aşîtiyane bi raya giştî re parve kir. Abdulah Ocalan di peyama xwe de weha dibêje: ‘Ger şert û merc pêk werin, hêza min a teorîk û pratik heye ku ez vê pêvajoyê ji qada nakokî û tundiyê derxim qada hiqûqî û siyasî.’ û dewletê dubare vedixwend aştiyê.

Lê li aliyê dewletê mixabin sed sal e tiştekî li ser navê aştî, wekhevî, azadî û aramiyê tune ye. Dewlet dîsa li pey deg û dolaban e.

Li hêlekê hevkarê desthilatdariyê, Bahçelî bi ferzkirina çekberdana PKKê ji bo Ocalan bi pêkanîna ‘mafê hêvîyê’ goya destê aşîtîyê dirêj dike, li hêla din jî bi destê rejîma qeyyûman xespkirina vîna kollektîf a Kurdan, qedexekirina çand û zimanê Kurdan, bi operasyonên sîyasî binçavkirin û dîl girtin didome. Îro jî şerê navxweyî ên Sûriyê geş dikin. Di şerê navxweyî yê Sûriyê ew armanca sereke ya desthilatdariya Tirkiyê ew e ku li bakûrê rojhelata Suriyê Kurd nebin xweyî statû. Erdogan û alîgirên wî vê helwestê eşkere dîyar kirin.

Wextê mirov li dîrokê û li geşedanên rojevê dinêre mirov fêm dike ku helwesta desthilatdara AKP û MHP û mêjîyê dewletê ne li ser aştiyê ye. Armanca wan ew e ku rasterast tevgera Kurd radest bigirin. Ev helwest ne rast e û Kurd jî êdî nakevin van defikan. Tevgerên Kurd hemûyan jî eşkere kirin ku ji bo aştiyeke mayînde û birûmet amade ne.

Helwesta Ocalan ji bo wan ji derbas bûyî ye. Wê demê mêjîyê dewleta Tirk û desthilatdara wan ku dilsoz bin, bila şert û mercên dîyalogê ava bikin û ji bo aşîtiyê bi Ocalan re dest bi danûstandinan bikin. Lewra Ocalan gotibû ji bo aşîtiyê ku şert û merc pêk bên ez xwediyê hêza teorîk û pratîk im. Lê belê em baş zanin mêjiyê dewletê ne ji bo aştiyê ye, ji bo têkbirin û tunekirina vîna hevpar an kurdan e.

Bahçelî di axaftina xwe ya balkêş de dibêje ‘Ocalan bi şertê ku PKKê ji holê rake, bila were li meclîse biaxive’ dixwaze ku pêşî, li pêkanîna biryara ‘mafê hêviyê’ a ku Dadgeha Mafê Mirovan a Evrûpayê (DMME) ji bo Ocalan daye lê bigire. An jî bi pêkanîna vê biryarê dixwaze ku tevgerên kurd berê hev bide û tevgerên kurd tasfiye bike.

Îro şerê Sûriyê ê navxweyî bi destê hêzên emperyal û çeteyên wan dîsa geş bûye. Encama vê şerê çi bibe bila bibe ji îro de qet ne dîyar e, tu kes jî nikare paşeroja vî şerî pêşbîn bike. Ji ber wî jî em di serî de ji Tirkîyê û Sûrîyê bigire bang li hemû dewletên rojhilata navin dikin.

Eger hûn dixwazin xwe û gelê xwe biparêzin, nekevin xeterryê, dest ji êrîşên li ser kurdan berdin. bi deg û dolaban û li ser navê aşîtiyê dest ji radestkirina kurdan berdin.  Dest ji antî-kurdbûnê berdin, mafê Kurdan binpê nekin. Statûya Kurdan qebûl bikin. Da ku aştî û aramî û demokrasî were rojhilata navîn.

Sed sal e em dibêjin neyartiya bi kurdan re aramiyê ji tu kesê re neaniye, yên ku neyartiyê bi kurdan re kiribin ew her dem têk çûne. Binêrin li dîrokê; kî bi kurdan re li hev be li rojhilata navîn serdest e, kî bi kurdan re neyar be li rojhelata navîn bin dest e.

# Kurd li Dojeha Rojhilata Navîn li ber xwe didin

## Hêrs û kîna Kurdan a mafdar û rewa li her derê dikare bibe guleyek ji agir. Kîjan hêz anku dewlet dibe bila bibe, dojeha ku ji Kurdan re ava dikin dê ew bi xwe di nav wê dojehê de bişewitin

Enes Yildiz



Dema ku em dibêjin baskên Îranê qut kirin û xwestin ku Hamas-Hîzbulahê tune bikin çavkaniya çareseriya pirsgirêkan ne yek e. Hinek dibêjin Heleb, hinek dibêjin diyalog girîng e. Êrişên Îsraîlê jî Îran li Sûriyeyê lawaz kir. Derbên ku Îranê xwarin, bandor li ser Esad jî kir. Mîna ku agirbesta li Lubnanê dihat pêkanîn û Sûriye jî careke din ber bi dojehê ve hat birin.

Dema ku Tirkiyeyê dixwest bi diyalogê dagirkeriya xwe bidomîne, Esad ev yek qebûl nekir. Devlet Bahçelî got, hê tiştek dereng nîn e. Hemû hesabên xwe li ser naskirina rêveberiya xweser a ji bo kurdan esas digirin. Herwiha Erdogan got serkeftinek mezin û biçûk nabe. Ji aliyê din ve Rûsya ji ber ku bi Ukraynayê re di nava şer de bû nekarî yan jî nexwest li Sûriyeyê pêşiya têkbirina pergalê bigire. Sedema ku Esad pê şaşopaşo bû rewşeke çaverêkirî bû û ev yek weke derbeyekê hat binavkirin.

Rewşa kurdan û bakurê Sûriyeyê cuda ye û di ber ku rewş her kêliyê biguhere. Û di vê dojehê de kurd jî hene ku naxwazin fersendên dîrokî ji dest bidin û li cihê xwe li ber xwe didin. Bombe hatin barandin, kurdan li ber xwe dan. Bajarên wan hat dagirkirin, wan li ber xwe dan. Bi hezaran dojeh derbas bûn, lê dîsa jî wan li ber xwe dan. Li dijî DAIŞê li ber xwe dan. Em vegerin ser mijara xwe. Rastiyeke kurdan heye ku li dijî êrişên hemû komên terorîst û cîhadist ên ku ev 13 sal in dilsoz û piştgirên Tirkiyeyê ne, li ber xwe dane. Ji sala 2012an ve Dewleta Tirk li gor plangeriya ku Sûriyeyê dagir bike tevdigeriya. Dewleta Tirk di navbera salên 2022-2024an de xwest bakurê Sûriyeyê parçe bike.

Mezheb bandorê li şer dikin, nijad, ol, ziman û dema ku mijar tê ser çandê, ew jî bandorê li ser gelên Sûriyeyê dikin; nemaze li ser kurd, ereb û hemû mafên hemû sûrîyeyiyan.

Tu dojeheke ku Sûriye nejiyaye nemaye. Piştî dagirkirina Efrînê li bakurê Sûriyeyê qadên petrolê, dibistan, stasyonên elektrîkê, kargeh û gelek cihên din hatin bombekirin. Senaryoya kevn li Helebê û derdora wê hatibû çêkirin. Pergala Sûriyeyê di kêliyekê de ji qadê derket. Dema hevdîtinên li Îmraliyê dihatin nirxandin li Sûriyeyê hemû hesab li ser maseyê bûn.

Hakan Fîdan li Ingîlistanê, sekreterê NATOyê li Enqereyê hevdîtin pêk anîn. Dema ku Ingilistan, DYA û Îsraîl ev senaryo bi rê ve birin, serkariya vê dagirkirinê jî dan Erdogan. Beriya her tiştî teqez daliqandina ala Tirkiyeyê li Helebê nabe serkeftineke ebedî ji bo Tirkiyeyê. Artêşa Tirk van koman bi pêş ve bir. Bi ketina Şehba û Til Rifatê, planên Mîsakî-Mîlliyê dixin meriyetê, tevgera dagirkeriyê dimeşînin û bi taybetî bi meşa mehterê re atmosfereke pîrozbahiyê ava dikin; lê ev nikare bibe serketin.

Ji bo gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hê her tişt neqediyaye. Aşkera ye ku kevirên ku dê hêdî hêdî çarenivîsa Sûriyeyê diyar bikin hê bi temamî nehatine bi cihkirin. Armanca wan tenê ji holê rakirina Rêveberiya Xweser û destpêkirina pêlên nû yên êrişan e. Îşaretên êrişên nû tên dîtin. Bi kurtasî êrişên li ser rojavayê Feradê û bi taybetî jî li Minbicê û derdora wê dibe ku zêdetir bibin.

Komên HTŞ û OSO yên ku ji aliyê Dewleta Tirk ve hatin destekkirin, dîsa anîn qadan. Dewleta Tirk ji sala 2011an ve ev planê dişopand. Bi taybetî jî tim gef dihatin kirin ku digotin “Em ê destûr nedin korîdora kurdan û em ê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hilweşînin.”

Hevdîtinên Astana û Soçiyê ku her tim qeyrana Sûriyeyê xist rojeva xwe, ji destpêkê ve têkçûyînek û şermezariyek bû. Pergala Sûriyeyê neçar ma ku ji Helebê vekişe ji ber ku nikare piştgiriya Îran û Rûsyayê werbigire. Herwiha kurdan parastina gel bi vekirina korîdora mirovî ji bo zirarê negihîne sivîlan esas girt. Niha bi sed hezaran kes li bajarê Tebqayê di konan de dijîn. DYAyê got: “Em naxwazin di mijara Sûriyeyê de alozî derkeve.”

Herwiha dibêje ku, ew hevpeymanê me yê herî mezin e ku li dijî hêzên HSD û DAIŞê li ber xwe didin. Wisa dixuye ku her aliyek dê bibe qada pevçûnê. Xuya ye ku Hêzên Sûriyeya Demokratîk ê li Dêrezorê bi pêş ve biçin û herêmên ku ji aliyê hêzên pergalê ve hatine hiştin kontrol bikin. Dewleta Tirk a ku dixwaze bajarê Minbicê dagir bike, helbet ê bixwaze êrişî bajarê Kobanê jî dagir bike.

Yan ê weke berê be, yan jî felaketeke din li benda me ye. Pirsgirêka Sûriyeyê jî Kurdan eleqedar dike. Tecrîda li Îmraliyê Kurdan eleqedar dike. Di rastiyê de yekane xema Kurdan jiholêrakirina pergala Îmraliyê ye. Tirkiye bi komkujiya Kurdan a li bakurê Sûriyeyê dibe ku ne li Enqereyê, ne jî li Qeyserî û Osmaniyeyê bêxew bimîne. Her dojeheke ku li Rojhilata Navîn bi serê kurdan de tê jiyîn jî...

Anku hêrs û kîna kurdan a mafdar û rewa li her derê dikare bibe guleya agir. Kîjan hêz anku dewlet dibe bila bibe, dojeha ku ji Kurdan re ava dikin ê ew bi xwe di nav de bişewitin...



Medenî Ferho

# Têkoşîna hevpar

Teror û anarşiya bloka faşîst dikare bi têkoşîna hevpar têk biçe.

Hişmendî, hiqûq, demokrasî, exlaq, nirxên insanî, rastî di devê tivingê de ne. Nijadperestiya Îttîhat û Teraqiyê wek salên 1915an radîkal bûye. Di 2yemîn sedsala komarê de, desthilatdariya AKP/MHPê dixwaze ruhê ‘mîsakî millî’ bi beden bike.

Mîratzedeyên Îttîhat û Teraqiyê bi destên çeteyên tundrew yên selefî û çeteyên ku bi destên xwe ava kirine û navê Artêşa Neteweyî ya Sûriyeyê (OSO) li wan kirine, êrişî Bexda û derdorên wê kirin. Erdogan ku di dema êrişên çeteyên DAIŞê yên li ser Kobanê de got “Em ê li mizgefta Emewî nimêj bikin” wan xewnan dibîne.

Balkêş e, Erdogan ji roja çeteyên DAIŞê derketine holê û heta îro, li ser navê komên çete diaxive. Wan weke leşkerên xwe dibîne, dema êrişan dikin jî, xewn û xeyalên xwe tîne zimên. Jixwe demekê got; “Ew çete, ‘Kuvay-î Miliye’ ne. Anku hêzên me yên neteweyî ne.” Lê derdorên wî lê hilatin û gotin, “Wê gotinê bi kar neyîne, ev kom terorist hatine ragihandin, ê me jî tewanbar bikin.” Wî jî carake din ew gotin nedikir. Piştre komeke çeteyan a bi nave OSOyê ava kir. Beriya wê jî Koma Tevgera Nuredîn Zengî, Eniya Azadiya Neteweyî, Ceyş el Îzze, Ensar el Îslam, Ensar el Tevhid, Ceyş el Nasir, Ceyş el Ahrar, Feylak el Şam, Suvvar el Şam, Sukur el Şam, Ahrar el Şam û Tûgayên Turkistanê ava kirin. Îro jî ev komên çete di bin siwana HTŞê de êrişan dikin.

Êrişa çeteyên selefî û OSOyê plana 2yemîn a Dewleta Tirk e.

Em hinekî vebêjin: Fermandarê Giştî yê Artêşa Bejahî ya Tirkiyeyê Selçûk Bayraktar, 10ê Cotmehê çû herêmê, tifaqa çetayan ava kir. Piştre, odeya hevbeş a operasyonê ava kir ku ev ode li bin sîwana MÎTa Tirk kar dike. Ji bo vê jî, êrişa çeteyan ne surprîz bû. Ji ber ku beriya niha Erdogan û rayedarên desthilatdariyê gotin ku ew ê li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û Sûriyeyê operasyonê bidin destpêkirin. Lê Rûsya û Amerîka li dijî operasyonê derketin. Tirkiye li benda hilbijartinên Amerîkayê rawestiya û hêviyên xwe bi Trump ve girêdan. Piştî serketina Trump, yek ji kesên ku pêşî bi lezgînî ew pîroz kir Erdogan bû. Hêviya Erdogan ew bû ku Trump hêzên Amerîka ji Sûriyeyê paş ve bikişîne û ew di cihê wan de li Sûriyeyê bi cih bibin. Lê bijartinên Trump ên wezîran hêviyên Dewleta Tirk û Erdogan têk birin.

Erdogan hawara xwe gihand Putîn û xwest bi Beşar Esed re bê cem hev. Got, ev hevdîtin dikare wek serdana malbatê jî pêk were. Lê çênebû, lewma Erdogan ji Putîn enirî û plana 2yemîn pêk anî.

Anku siyaseta axtapot a mîratzedeyên dewşîrme, careke din ne di aliyê entelektuelî de, di aliyê şer, lîstik, dek û dolaban de derket holê. Filozofê Cihû Bernard Henry Levy ku di şerê Bengladeşê de rojnamegerî dikir di şerê Bosnayê de çavdêrî kir, di şerê Afganistanê de li dijî Talîbanê cih girt dibêje; “Bi navê netewparêziyê, hem dîrok tê kuştin, hem mirovahî tê tunekirin.” Ji roja dewleta Enqereyê hatiye avakirin û heta îro, ji bo kuştina dîroka gelan û qirkirina gelan kar dike.

Ya balkêş ew e ku xwedî rastmalên mezin, bazirgan û bankerên li Tirkiyeyê jî, di xizmeta netewperestiyê de ne. Dewleta Enqereyê, ne ji bo gel e, gel ji bo dewletê heye. Zanistên li Tirkiyeyê jî ji bilî gotina ‘methiye-pesindarî’ya desthilatdariyê tiştekî bi zad nakin.

Di demeke ku desthilatdariya AKP/MHPê, bi devê gurê pîr xwe avêt tor û bextê Rêber Abdullah Ocalan, bi tîpolojiyeke siyaseta bohemwarî, şaredariyên gel xesp kirin, qeyûm tayin kirin û di heman demê de êrişên çeteyên selefî dan destpêkirin. Erişên çeteyan, xespkirina şaredariyên gel û qirkirina siyasî, xistin rêza duyemîn.

Dubare bibêjim; cîhanê hê faşîzma dewşîrme nas nekiriye. Belkî ev faşîzm, li xiş û hesabê hêzên global tê. Ji ber ku siyaseta lîberal ji bilî berjewendiyan tiştekî din nabîne; nirxên mirovahiyê, exlaqê, filan û bêvanan nas nake. Lewma mîratzedeyên dewşîrme, ji aliyekî ve siyaseta bukelemûn dimeşînin, ji aliyê din ve siyaseta durû; bi gotina Ewropayiyan siyaseta dublex, bi kar tînin. Ev siyaseta ‘tecawizkariya kujerî’ ye. Tecawizkariya kujerî, exlaqê civakê tune dike û civakê di nava xwe de êrişkar dike.

Di pergala dewşîrmeyan da, islah-terbiyeya jiyana madî û manewî nin e. Islaha madî, destê bi hêz û şelandina siyasî ye; aliyê manewî jî, kuştina zanista entelektuelî ye. Di aliyê dinyewî de dewlet, di aliyê axretî de dîsa dewlet heye. Pirs: Di vê pêvejoyê de, gelo bangên aştiyê dê çiqas bikaribin pêk bên? Pirs du: Eger banga aştiyê dikin, eger Abdullah Ocalan vedixwînin parlamentoyê, gelo dê rêyeke çawa vekin? Rêvekirin hêsan e. Serokê ÎYÎ Partiyê Musawatê ji wateya navê xwe dûr, bang li Erdogan kir ku hêz û mafê xwe yê efûya ji bo Ocalan bi kar bîne. Banga Musavat Derwişoglu jî gefxwarina li Erdogan e.

Ji ber ku li Tirkiyeyê normên demokrasî û hiqûqê nîn in desthilatdarî nikare bi cesareta Fermana Tanzîmatê jî hereket bike. Weke di pêvejoya aştiyê de, bi siyasetek dublex riyakarî Mutabaqata Dolmabaxçe ji hole rakirin, îro jî bi êrişa çeteyên selefî, banga aştî û çareseriyê têk birin.

Prof, akademisyen û nivîskarên Tirk jî nikarin bi cesareta dîrokzan Bernadr Lewîs, ku çar milên Kurdistanê anîn cem hev û nexşeya Kurdistane xêz kir hereket bikin. Newêrin behsa daxwazên kurdan jî bikin, newêrin bibêjin kurd, parçekirina 4 dewletên tempon naxwazin, lê di nava sînorên van dewletan da statukoyê dixwazin. Na, di nijadperestiya dublex de, her kiryara desthilatdariya faşîst mubah dibînin, a civakan terorize dikin.

Bêguman di vê serdemê de, bar dikeve ser milên kurdan. Helbestkarê FrOSOî Pauld Eluard dibêje, “Eger hûn aştiyê dixwazin şerê sivîl bikin.”. Anku divê kurd şerê sivîl dijwar bikin.

Em çiqas bibêjin ku desthilatdariya despot ketiye pêvajoya têkçûnê jî, ew bi şerê qirêj ê pirhêlî temenê xwe dirêj dike. Beriya êrişa çeteyên selefî, zanyar, rojnameger û akademisyenên alîgirên Erdogan jî mikûr dihatin ku têk diçe. Lê piştî êrişa çeteyên selefî tevan zimanê xwe guhertin. Beriya niha yek ji alîgirê Erdogan û parêzvanê dîroka fermî, Prof. Dr. Alîcan Mustafa jî mikûr hat û got; “Dev ji naveroka pexşanan berdin, em li ser rastnivîsa hevokên akademîsyenan radiwestin. Di tiştên tên nivîsandin de, ne rastî û ne rêkûpêkî heye.” Ev têkçûna aliyê herî xurt ê hişmendiya dewlet û desthilatdariya dirinde ye.


Ev desthilatdarî bi xeyalên emperyal ên osmanî tevdigere. Em çiqas bibêjin ku ev desthilatdarî asoyên tarî yên li pêşiya dewleta Enqereyê bêhtir tarî dike, xêr nake. Lingên gotinên me li hewa dimînin. AKP/MHP dixwaze destûrnameya sala 1924an amade bike û reîstiya Erdogan a heta mirinê mîsoger bike. Şêwirmendê Erdogan Mehmet Uçum ev armanca Erdogan aşkera kir.

Em bi xetên stûr bibêjin: Zext û zora bi destê dewlet û desthilatdairyê bi normên tunekirina fizyolojîk, antropolojîk, sosyolojîk, psîkolojîk, dîrokî, aborî, çandî û siyasî dewam dikin.

Tenê dimîne têkoşîna kedkar, karker, xwendekar, jin, mixalafet û gel. Heke tifaqeke pirrengî derkeve hole dê bikaribe teror û anarşiya bloka faşîst têk bibe.

# Rejîmo bîpolar

Dewleta tirke hetêk ra Rojava de hemverê kurdan polîtîkaya qirkere ana ca û qayûman tayîn kena, hetekê bînî ra Anqara de behsê pêvînayîşan kena. Hem şer hem zî pêvînayîşan seba menfaetanê xo şuxilnena



Merkezê Xeberan

Êdî Tirkîya de “gerontokrasî” est o. Yanî îqtîdarê kokiman est o. Îdarekarê kokimî yan pîrî seba ke îqtîdarê xo heta peynîya cuya xo bipawê, her tewr “fêlbazîye” kenê. Nê kokiman ra yew Erdogan o, o bîn zî Bahçelî yo. Yew padîşah o, o bîn sey “sedrazamî” xebitîyeno. Padîşah ferman dano, o bîn nê fermanî desinde ano ca. Coka karê Bahçelî destpêk ra heta peynî pabesteyê waştişê Erdoganî yo. Erdoganî de nika tersê vîndîkerdişê îqtîdarî est o. Çike goreyê qanûnê bingeyî hinî nêeşkeno serokkomarîye rê “namzed” bibo. Êdî derya qedîya, rejîmo xeripîyaye resa asta peyêne. Nika verê Erdoganî de dide rayîrî est ê. Yan o do weçînayîşê verênî bikero, yan zî qanûnê bingeyî yê newî bikero. Seba weçînayîşê newî her çî destê ey de nîyo. Çike parlamento de ganî 360 parlamenterî bêrê têhet û raye bidê ke weçînayîşo verên bêro kerdene. No zî bes nîyo. Partîyanê muxalîfan ra CHP vano ke ganî weçînayîşo verên zêde herey nêbo. Serekê CHPyî Ozgur Ozel çend hewteyî yo îfade keno ke wa weçînayîşo verên heta aşma teşrîna peyêna 2024î bibo. Eke herey yeno kerdene, CHP do hetkarîye nêdo.

Hukmatê Erdoganî xo ra zêde bawer nêkeno. Çike eke demê nêzdî de yanî teşrîna peyêne de weçînayîş bikero, o do bi îxtîmalêkê girdî bin bikewo. Coka Erdogan wazeno dem qezenc bikero û dima ra qerarê weçînayîşî bido. Na rewşe de hetkarîya CHPyî do nêbo. Peynî de kam maneno? Bêguman DEM Partî. Coka estbîyayîşê kurdan seba rejîmê seraye xeylê girîng o. Erdogan zano ke weçînayîşê verênî de rayê kurdan zaf muhîm ê. O eşkeno têna bi rayanê kurdan weçînayîşî qezenc bikero. Naye ra ber ci rê xelase çin a. Eslê xo de çarenusê weçînayîşê tirkan destê kurdan de yo. Nê semedî ra sedrazam Bahçelî her hewte derheqê pêvînayîşan de tayê gamanê efsunan erzeno. Bêşik semedê Erdogan û Bahçelî kurdan reyde pêvînayîş yan nermbîyayîş birîsk o. Çike zafêrîya bermalê înan nîjadperest a. Baxusus terefgirê Bahçelî vera çekuya kurd bîla bêtehemul ê. Coka klîkê Erdogan û Bahçelî mîyanê “gêrawe” de yo. Eke kurdan reyde pêvînayîş bibo, bermalê înan ra tayê kesî eşkenê derbasê partîyanê bînan bibê.

### Serekkomarîya muebbede


Armancê îqtîdarê Erdoganî yo bîn zî kerdişê qanûnê bingeyî yo newî yo. Hukmatê ey ge-ge vano “komelê Tirkîya” rê qanûno bingeyî yo newî û “hemdem” hewce keno. Birastî komelî rê nê, Erdoganî rê hewce keno. Ey rê serekkomarîya “muebbede” hewce kena. Merdimo ke îradeyê şarî nêşinasneno, şaredaran wezîfe ra erzeno û merkezperestîye ra hêz gêno, senîn seba komelî qanûnêkê hemdemî amade bikero? Hişê Erdoganî de têna û têna “otokrasî” est o. O wazeno ke şar “teba” bibo. Goreyê ey serdestîye bê şert aîdê şarî nîya, aîdê Homayî zî nîya, aîdê ey a. Êdî Erdogan xo sey Homa vîneno.

### Îqtîdaro polîmorfîk

Îqtîdarê Erdogan û Bahçelî “polîmorfus” o. Na çekuye latînî ya. Kirmanckî yena manaya “zafformin yan zafsembolin”. Rejîmê seraye zî polîmorfîk o. Xo ra her game de “reftarêko bîpolar” yeno çaxkerdene. Sedrazam rojêke vano “wa DEM Partî şêro Abdullah Ocalanî reyde bêro têhet”, eynî roje şan de Kurdîstan de şaristanêkî rê qayûm şiraweno. Serê sibayî “Îsa” yo, şan de ravurîyeno bi “Musa”. Bêşik na zî polîtîka ya. Qayûm tayînkerdiş de çend armancî est ê. Yewin îdareyê Erdoganî rê pereyî hewce kenê. Dideyin kurdan rê şantaj kenê û bi tayînkerdişê qayûmî kurdan rê waştişanê xo ferz kenê. Yanî vanê ke “bêrê ma pêvînayîş bikerê, ma çi wazenê qetî qebûl bikerê û ma rê îtaet bikerê, eke nêkenê, ma vera şima şîdetê dewlete şuxilnenê.” Nameyê nê yo bîn rejîmê seraye wazeno ke têgêrayîşê kurdan teslîm bibo.

### Heleb û Rojava

Şantaj têna Bakûrê Kurdîstanî de nê, Rojava de zî ramîno. Seke zanîyeno 27ê teşrîna peyêna 2024î de HTŞyo ke Tirkîya ra hetkarîye girewte, hêrişê vera Helebî kerd. Rixmo ke îdareyê Erdoganî pêvînayîşanê Astana de Rûsya û Îranî rê wad da ke Îdlîb de cerganê HTŞyî kontrol bikero û hêrişê vera Esadî asteng bikero, labelê wadê xo nêtepişt. Qaso ke dormeyê Îdlîbî de baregehê Tirkîya yê leşkerîyî ameyî awankerdene, nê baregehî bi destê HTŞyî sey “mertal” xebitîyayî. Putînî garane teslîmê Erdoganî kerde, Erdoganî vergî reyde peymane kerde û garane teslîmê vergî kerde. Dîktatorî dîktatorê bînî rê “xîyanet” kerd. Gama ke HTŞyî hêrişê vera Helebî kerd, dewleta tirke Artêşa Neteweyî ya Sûrîye (SMO) erşawite ver bi Til Rifat û bajarek ame îşxalkerdene. Tîya de armancê îdareyê Anqara bêguman serobinkerdişê otonomîya Rojava yo. Sedrazamê Erdoganî Bahçelî vano ke “Sûrîye aîdê sûrîyeyijan o”, yew bîn zî ey ra biperso “gelo êyê ke Rojava de ameyoxê xo awan kenê kam î?”. Seke fîlozofo rûmen Emîl Cîoran nuseno “her estbîyayîş, mergê estbîyayîşê bînî reyde xo weye keno.”



Zaza Cebelî

## Kayê Şerê Taybete

Şerê taybete nê 40 serrî yo vêşêr o ke ,vera Têgêrayîşê Azadîyê Kurd reyde bi hêzanê emperyalan reyde şer kenê.Şerê taybet bi taybetî vera şarê kurdan ra heme ray û rêbazê qilirênî gurênayî. Şerê taybete nê warî de qet yew netîce nêgirot o.Îktîdarê AKP û MHP hetê sîyasî,. debarî û leşkeri ra xo qedêna yo. Enka zî wazenê ke tikêna emrê xo derg bikerê. Nay ra zî wazenê ke nê kayê qilêran reyde kurdan bixapênê. Enka zî wazenê ke bi şexşê şarê kurdan de Rayberê Şarê Kurdan reyde muzakereya û çareserîya xapênayîşî bikerê. Çapemenîya tirkan her roj xob û xo senaroyan virazenê. Sakî Rayverê Şarê kurd reyde muzakereye çareserî viraşto û enka zî Qandîlî senîhewa bertiraf kenê Hetê bînra zî statuye Rojawanî sekenê. Gorê îna en pisgirêke gird statuye Rojawanî yo.

Bahçelî seba pêveynayîşê Rayver Ocalanî ra her roj yew qale vîneno raşte û nê warî de yew netîce çinî yo.Bahçelî hem vano “va Partîya Dem şêr o Rayver Apoyî reyde pêveynayîş bikero û hetê bînra zî Partîya Dem tehdît keno. Vano” şima na Partîya Şaranê tirkîya benê û nazî biqedîyê.Ha eyro ha siba Hemserokê Partîya Dem şîyenê Girawa Îmralî yew xebera xeyrêna anê. La hetê bîn ra zî hetê sazîyê û dezgeyê kurdan ra operasyonê qirkerdişî virazîyenê. Û îradeyê kurdan xesp kenê.s Ana kenê ke îradeyê şarê kurdan bişiknê û bêhîvî verdê

Sûrîye de aktorî newera bedilîyenê yew hetira çeteye HTŞ û hetê bînra zî tirkîya çeteyanê DAIŞ û SMO dekerdî dewre.Serokwezîr Erdogan en peynî de fekê xora baqla vetê û “vat ma Sûrîye de yew koridor akenê.Nê koridor zî êrîşa Rojawanî ya.Nê esna de nêşkavera çeteyê bîncê DAIŞ î, HTŞ û SMO vejîyayê raşte û bi stîlê DAIŞ î ra êrîşê Helebî kerd û leşekerê Esadî çekê xo û tifingê xo caverdayî û tepa remayî. La gelo Esadî çîrê verê nê çeteyan ra xoveronêda ? . Peyê nê çeteyan de kam esto û kam çinîyo? Heyana eyro yewerî nê çeteyan ra vayîr nêvejîya. Badî zî Rojanamegerê tirka rîpelê xo de mahşet vist û va operasyonê şefeqî destêpê kerd. Tira dime zî Bahçelî va enka zî newbe ameya Minbîç. Vejîya raşte ke heyana eyro nê çeteyî HTŞ û SMO tirkîya paştî daya û veye kerdî. Ewta de pêvajoya Astena pûç bi.Ewro zî nê çeteye êrîşê Rojawanî kenê. Nê çeteyi verê êrêşê heremanê Sûrîye kerd û enkazî hetê Til Rifatî ra êrîşanê xo domnenê û hetê Hama ra gale kenê.

Rohelatê Mîyanênî de verê verkan şerê Îsraîlî û filîstînî destpê kerd.Hesaban ra nê rojan de Îsraîlî Lubnanî xo mîyan de yew peymanê adir binayîşî viraşt.Nayra zî Sûrîye de şerê qilêrinî destpê kerd. Rojhelatê Mîyanênî de qazanê keledayî girîyeno û heme hewara qirkerdişê miletan virazîyenê.Rohelatê Mîyanênî de nê qirkerdişî qeder nîyê.Nê warî de hêzê emperyalan wazenê ke Rojhelatê Mîyanênî de newera kereyê nexşan bibedilnê û dîzayan bikerê No sebeb ra yo ke emperyalan êrîşê nê çeteyan ra musade kerd. Ana aseno Hînê gureye Esadî qedîya.Hînê sewbîna aktorî vejîyenê raşte. Rojhelatê Mîyanênî de en rizaya zeyîfe girîya kore bikerfîyo se, şorişa şaran virazîyena.Modelê şorişîya şaran Rojawanî de raşte da û heme mileta şaran xo tede îfade kena û pîya têreyde ciwîyenê.

Ganî kurdî zî heme hewara mewzîyanê xo bipawê. Rewşa Kobanî ya dîyine nêvirazî yo. Ganî nê warî şarê kurd heme çîyer leteyanê kurdistanî de seferberîya xo virazê û xoverdayîşê camêrdeyî xo vero bidê.

**Çengeyê Edebîyatî**



## Gula Xizirî

**Arêkerdox: Xidirê Başî**

**Cêreno**

Qelbê mi nêvindeno zerê mi veşeno
Cêreno Xaşxaşe de Muska de çîn a
Eşqê to mi verem keno kişeno
Cêreno Gadiza de Şema de çîn a

Yara mi ez caverdo xêlî zeman o
Birîna mi jan dana ez bêderman o
Mi ser a vareno zerûpişikê mi potî
Cêreno Sofîya de Reqasa de çîn a

Mi nêzana gula mi şîya kotî
Vanê avar de şîya dewanê dotî
Ez veşeno zerûpişikê mi potî
Cêreno Tazige de Tata de çîn a

Raya mi kewte nahya ez şîyo qewa
Şuşê çay şimit şîyo ver ba dewa
Roje bîye tarî mi ser a şew a
Cêreno Hemuge de Çorsane de çîn a

Mi pers kerdo ke nîyama Canesera
Xwarike, Qasima şîya Emera
Seba to ez şewe mendo tever a
Cêreno Bada de Civarka de çîn a

Mi va bota şorî dewanê koyî
Rêça to mi berda kerda ortê soyî
Yara mi xo tadana êna pê doyî
Zengena, Kuzike, Mengel de çîn a,

Xidir pers keno şar nêzano kam a
Aman Ûskira va teze ama
Heq razî bo şima xebere da ma
Cêreno Çarşî de dukan de çîn a

***

**Mele Waneno**

Mele waneno mi ser a bedenê mi dirnenê
Na dinya to rê bo xo tede tade
Çend hebî nişenê ro kefenê mi birnenê
Na dinya to rê bo xo tede tade

Waxto ke felek ama ez berdo
Leşa mi ra royê mi vet ez merdo
Meberbe mi sera mevaje derdo
Na dinya to rê bo xo tede tade

Ez heleno kişto, bîyo verem
Veşno to xo dime ez kerdo Kerem
Helîyo qelîyo ez bîyo jû dîrem
Na dinya to rê bo xo tede tade

Na roja merdena to rê bîya ferze
Bê cenaza mi ser şermê xo berze
Ebe destanê xo kefenê mi biderze
Na dinya to rê bo xo tede tade

Roja mi şîye, mi derbaz kerde dora xo
Xatir be to şono lê sadiq yara xo
Nasîb bo wele ra cêno para xo
Na dinya to rê bo xo tede tade

Ti kî zana ê mi ne roj a ne tale wo
Seba to ez merdo vanê
Xidir kal o
Mi ser a kerenê dostî çend salo
Na dinya to rê bo xo tede tade

***Çime:*** Xidirê Başî, Gula Xizirî, Weşanxaneyê Vateyî, Stenbol, 2012, rr. 81-87.





Kewê Redkan

# Karkerên reşik

Di dema payiza derengî de em silk û kartolan ji zeviyan derdixin. Silkên ku em quçquçî dikin, bi erebeyên mezin ve dişînin cihê ku dibe şekir. Kartolan jî ji bo zivistana dereng ji xwe re dihêlin. Îsal bereket ketiye nava zeviyên me, em hemû der û cînar bi alîkariya hevûdu nikarin biqedînin. Ger em niha wan ji nava axê dernexin ê berf bi ser bibare û hemû jî wê bicemidin. Piştî ku ew bicemidin êdî xêra wan ji me re namîne.

Ji ber wê jî me got gelo em dikarin çend mirovan wek pale bigirin da ku em zû biqedînin. Evdo got; "Pîî hûn çima ji min re nabêjin? Ez gelek kesan nas dikim, di van karan de serketî ne, ew ê di du rojan de silk û kartolan ter û temîz ji we re derxin, hûn qet destê xwe naavêjin tiştekî." Êê me jî ji Evdo bawer kir û got: "Erê." Sibetirê em rabûn çûn nava zeviyan. Dema ku em nêzikî zeviyan bûn me dît ku çend qeratî ji dûr ve xuya dikin. Berbanga sibehê bû, lewma çavên me ew baş nedidîtin. Em hinekî nêzikî wan bûn, me dît va ye ku Evdoyê me û çend mêrikên ku rengên wan reş in li benda me sekinîne. Em heyirî û metel man; gelo Evdo van mêrikên ku rengên wan tarî ne ji ku derê nas dike? Ez hinekî nêzikî wî bûm, min bi dengekî nizim got: "Birayê Evdo, te ev mêrikên hanê li ku derê dîtin? Tu wan ji ku derê nas dikî? Heta niha min qet ev evdên Xwedê li tu derekê nedîtine." Evdo got: "Heeey, hûn qet min jî nas nakin, ez gelek cureyên mirovan nas dikim, tenê hûn bibêjin em li filan derê, filan mirovan dixwazin ji bo alîkariyê, bes e. Ez ê mirovên hemû cîhanê li vir bicivînim." Min got: "Erê erê birayê Evdo. Ka bibêje ji me re, ev van karên ku em dikin dizanin an na? Ger nizanibin, ew jî guneh in û em jî, qet wextê xwe bi valahî derbas nekin. Em ê xwarinekê bidin wan, bêha rêya wan jî ser de, bila herin."

Li ser vê gotina min Evdo got: "Pîîî hûn tenê ji min bawer bikin, taştêyek, danê nîvro û êvarê xwarinekê bidin wan, ew ê di nava du rojan hemû karên we xelas bikin!" Min pirsî: "Ev reben zimanê me dizanin an na?" Evdo got: "Çawa nizanin, heta klamên dengbêjiyê jî hîn bûne, tenê hûn xwarina wan bidin, çewalan deynin cem wan, wekî din ew karê wan e." De me got: "Baş e, xwarin ne zehmet e, em dikarin ji wan re xwarinên baş çêkin, tenê bila ev silk û kartol di nava zeviyan de nemînin bes e." Evdo ji wan re got: "Hûn ê silk û kartolên di nava van zeviyan de derxin, em ê jî wan bikin çewalan." Gotin: "Erê."

Em jî bi şaş û metel vegeriyan malê da ku ji wan re taştê û xwarina nîvro û şîvê hazir bikin. Me ji wan re taştê rêkir, wan taştiya xwe xwarin. Piştî wê hinek cînar jî çûn alîkariya wan.


Dema ku nîvro me ji wan re xwarin çêkir, em hemû jî di nava kelecanekê de bûn; gelo ev hersê mêrikên reşikê tarî çawa dixebitin? Wexta ku me xwe gihand nêzikî zeviyan, me dît ku zeviyek qediyaye, ew çewalên ku tijî silk datînin ser erebê. Em metel man, gelo van çawa wisa zû ev zeviya bêserî û bêbinî qedandin? Evdo nêzîkî min bû û got: "Tu dibînî çawa dixebitin?" Min got: "Erê erê, va ye tu nabînî her yek weke dîwarekî ye, van çiqas gir û mezin in? Guneha min bi wan hat, em ê ji wan re xwarinên xweş çêkin, bila birçî nemînin. Ji wan re bibêje çiqas dixwazin bila bêhna xwe bigirin. Sibetirê dema ku em ji xew rabûn, me dît ku va ye tu dest bi karê xwe kirine. Dayê rebenê, ev çendeke em li ser hevdu diponijin, gilî giliyan vedike, ka gelo em ê çava ji nava van zeviyan derkevin? Va ye sê mêrik di nava du rojan de herdu zevî jî hema hema qedandine. Me hemûyan li çavên hev nihêrî û me şerm kir.

# Tiştanok

Gelî hêjayan mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

***1-*** Mamê mino
Ew jiyanên veşartî ne
Çîrokên hûr bijartî ne
Dest diavêjî ajdayî ne
De bizane ka ew çi ne
Ew çi ye?

***2-*** Mamê mino
Pel hêşîn û bihar e
Ji belengazan re xwar e
Dibe xurd û savar e
Ew li ber çeman war e
De bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***

***1-*** Pirtûk ***2-*** pûng

# Rewşa aborî

**Hesenê Hemkê**


Zilamekî navsere guneha xwe bi xwe anî û ji civatê re behsa rewşa xwe ya perîşan kir. Jixwe di vê rewşa qeyrana aborî ya giran de her kes gilî û gazincan dike. Yekê ji civatê ji zilam pirsî û got: "Xalê Şêxo, ma qey tu tenê dixebitî, ma zarokên te alîkariya te nakin?"

Şêxo got: "Ma di vê rewşa kambax de kar bi destê kê dikeve!" Yekî ji civatê dîsa pirsî: "Ma zarokên te ne xwedî kar in?" Şêxo got: "4 zarokên min hene, yek ji wan endezyarê makîneyan e, yek mamoste ye, yek jî endezyarê avahîsaziyê ye û yê çaran jî diz e." Yekî ji civatê jê re got: "Xalê Şêxo, çi karê yê diz di nava malbata te de heye, bera wî bidin, wî heram bikin, bila ji nava mala we derkeve." Xalê Şêxo got: "Hûn jî ne xerîb in, ez bi navê Xwedê bikim heke em bera yê diz bidin em ê tev di malê de birçî bimînin; ji ber ku tenê ew dixebite, yên din tev bêkar û betal in. Hemû mesrefa malê li ser milê wî ye, heke ez wî ji malê derxînim em ê tev birçî bimînin."

Îca mixabin di vê pergala wêranker û rewşa malwêran de derî heta dawî ji diz û talankeran re vekiriye û kesên dilsoz û bi xîret êş û azarên debara jiyanê dikişînin.



# XAÇEPIRS




## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ DE

**3-** Pêxemberek **5-** Cînavkek **7-** Di navbera dest û mil de **8-** daçekek **9-** Naveke keçan **13-** Sotemenî, êzing **14-** Çetîn, zor **16-** Rengek **19-** Rih **20-** Agir **21-** Kulîlk **22-** Ji niha şûn de **25-** Noteyeke muzîkê **26-** Navekî jinan, dayikeke berxwedêr a xizmên windakiriyan **28-** Danekî rojê

## JI JOR BER BI JÊR DE

**1-** Alîkarî, hevalbendî
**2-** Milyaket
**3-** Cejin
**4-** Irkî ku kurd û faris jî jê ne
**6-** Alaveke muzîkê
**10-** zeviya mêwên tirî
**11-** Cahil
**12-** Sala derbasbûyî
**15-** danekî rojê
**17-** Çira
**18-** Navê mehekê
**20-** Cihê ku êmê dewaran dixinê
**23-** Roja em tê de
**24-** Alava ku berê ji bo ava vexwarinê dihat bikaranîn
**27-** Dîn

## Bersiva hefteya borî



# Kes nikare êrîşê bîne ser rastiyê

| Rohat Bulut

Bi pêşengiya Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê ya Amedê (DTSO) û TUYAP'ê di navbera 30'ê mijdar û 8'ê kanûnê de li Navenda Kongre û Fûarê ya Mezopotamyayê ya Yenîşehîra Amedê 8'emîn pêşangeha pirtûkan hat lidarxistin. Di pêşangehê de gelek weşanxaneyên kurd têde cihê xwe girtin. Bi sedan nivsîkar û rewşenbîr beşdarî pêşangehê bûn. Her wiha mirov dikari bêje ev pêşangeha ku li Amedê hat lidarxisin wekî pêşangeha herêmê bû. Lewre ne tenê ji Amedê ji gelek barajên derdorê jî xwîner başdarî bûn. Naverok û zimanê panel û bernameyên pêk hat.

Li ser pêşengeha îsal û bi taybetî jî desteserkina pirûkên Weşanxaneya Aramê em bi xudiyê îmtiyazê yê Aramê Hakkî Boltan re axivîn. Boltan, li ser rewşa heyî û nêzîkatiya li hemberî weşanxaneyên nirxandinên girîng kir. Boltan, destnîşan kir ku eleqeyeke mezin ji bo weşanên kurdî hebû û da zanîn ku pêşengeha ku di 30 mehê de dest pê kir, coş û hezkirineke pirtûkan û xwedî derketina li çand, huner , wêje û nivîsandina kurdî wan kêfxweş kiriye. Boltan, got ku li darxistina pişangeha pirtûkan a li Amedê bi serê xwe girîngiyek e û ev tişt anî ziman: "Bi taybetî jî beşdariya nêzî çil xweşanxaneyên kurdî rengîniyeke ji bo pêşangehê. Eleqeyek mezin ji bo weşanxaneyên kurdî hebûn, ev jî ji bo me cihê şanaziyê ye."

Boltan, bi berdewamî eleqeya ji bo pirtûkan a li gorî salên borî û jî nirxan û got: "Em dikarin bêjin li gorî rewşa heyî eleqeyek baş hebû. Bi taybetî eleqeya zarok û ciwanên kurd mirov dikare bêje gelekî baş bû."





Li Amedê Pêşangeha Pirtûkan pêk hat û wekî her tim careke din polîsan pirtûkên Weşanxaneya Aramê desteser kir. Xudiyê weşanxaneyê Hakki Boltan xwest ku her kes di asta herî jor de li weşanên kurdî, çand û hunera kurdî xwedî derbikevin û got: "Heke xwedîderketin hebe kes nikare êrîşê bîne ser rastiyê."

**Xeta Aramê berjewendiyên gel**

Di vê pêşangehê de li hemberî Weşanxaneya Aramê ji aliyê polîsan ve êrîşek pêk hat. Hin pirûkên Aramê desteser kirin. Derbarê vê nêzîkatiyê jî Boltan ev tişt anî ziman: "Helwesta desthilatiyê ya li hemberî weşanên Aramê ne nû ye. Ev êrîş bêtehamuliyeke mezin e li hemberî Weşanxaneya Aramê ye. Ev ji kuderê tê? Çima li hemberî Weşanxaneya Aramê ewqas bêtahamulin? Bersiva van pirsan jî diyar e, ew jî naveroka berhemên weşanên Aramê ye. Aram ji damezirandina xwe û heta îro ji xeta xwe derneketiye. Xeta Aramê jî berjewendiyên gelê kurd e. Berjewendiyên gel ên maf, azadî û demokrasiyê ye. Ji ber ku nikarin vê xetê bitewînin, ji destpêkê ve ye li hemberî aramê êrîşên xwe pêk tînin. Di demên borî de jî em rastî pêkanînên wiha dihatin. Dema em diçûn fuarekê dest dadianîn ser pirûkên me û ji bo pirûkan qedexe derdixistin. Niha jî bi heman helwestê em rû bi rû dimînin. Hatin û pirûkên me yên ku bi salan e li stantên me ne û gihiştine bi hezaran kesî berhev kirin û birin. Ez behsa pirtûka Nelson Mandela dikim. Nelson Mandela ku di cihanê de deng veda ye û xeta Mandela û ya Aramê yek e. Çawa ji Aramê acizin wiha jî ji Nelson Mandela acizin. Li gel ku tu qedexeya pirtûkê jî tune bû hatin desteserkirin û birin."

**Berhemên mirovên qenc**

Boltan destnîşan kir ku ev bêtehamuliya li hemberî mirovên qenc e û wiha got: "Ên ku li cihanê tên hezkirin û xwedî hişmendiya baş, şoreşger, demokrat, azadîxwaz ku di şexsê Mandela de xwe dide der. Ev feraset û nêzîkatî jî di hemû pirtûkên Aramê de cih digire. Niviskarên me hemû jî bi vê hişmendiyê dinivîsinin. Her wiha Hatîp Dîcle jî ku remzeke civaka kurd e û ji aliyê kurdan ve tê hezkirin û pirtûka wî jî bêyî ku qedexebe desteserkirin. Ev jî nişaneya ku kesên ji aliyê kurdan ve bên hezkirin, temsîliyeta kurdan bike, maf û azadiya kurdan biparêze pirtûka wî ji bi heman awayî rastî vê pêkanîna dijhiqûqî tê. Pirtûka din ya ku desteserkirin a M. Hayrî Durmuş e ku Serokomarê Tirkiyê Erdogan bi xwe jî li Amedê di mitîngeke xwe de digot; "Ax Ax bila zimanên van dîwarên Zindan Amedê hebû bê dê çi bigota, çi negota". Belê Hayrî jî ew gotibû. Zilm û zora li Zindana Amedê anîbû ziman. Li dijî wê zilmê berxwedana şoreşgerên kurd anîbû ziman, greva birçîbûnê û rojiya mirinê anîbû ziman. Di pirtûkê de ev hatibûn nivîsandin. Pirtûka me ya din jî disa ya bi navê Dildarê Serkeftinê bû ku nasnameya kurdî, maf û azadiya kurdî, çand û demokrasiya kurdî di xwe de dihewand bû."

Derbarê van kiryaran de Boltan ev tişt anî ziman: "Ev hemû bi hev re dide xuyakirin ku neyartiyeke li hemberî gelê kurd e û weşanên bi hişmendiya azadî û demokrasiyê hatine nivîsandin e. Em jî vêya bi tu awayî qebûl nakin, dê gelê me jî li hemberî vê pêkanînê xwedî helwest be û li hemberî wana bi xwedîdarketin û sitendina pirûkan helwesta xwe nîşan bide ku van kiryarana vala derbixin."

**"Aram a me ye"**

Li beramberî vê êrîşa helwesta xwîner û weşangerên din Boltan da zanîn ku piştî van êrîşana gelek weşangerên hatin serdana wan, bertek û nerazîbûnên xwe yên li dijî desteserkirina pirtûkan nîşan dan. Boltan wiha dirêjî da axaftina xwe: "Me jî bi daxuyaniyekê bertekên xwe nîşan da. Bi taybetî jî xwînerên ku hatin ser standa me gotin "Aram a me ye" û xwedîderketina xwe nîşan dan. ev cihê kêfxweşiyê ye. Ev xwedîderketin dide xuyakirin ku dê ev gel stûyê xwe netewîn e, weşanger stûyê xwe netewînin û dê li çand, huner, wêje û zimanê kurdî xwedî derbikevin."

Boltan di dawiya axaftina xwe de jî wiha got: "Herî dawî dikarim vê bêjim; xwedîderketina li çanda kurdî, demokrasî, maf û azadiyê nebe nabe lewre mirov bi nirxên xwe dibe mirov. Ji ber vê yekê em jî dixwazin ku her kes di asta herî jor de li weşanên kurdî, çand û hunera kurdî xwedî derbikevin. Heke xwedîderketin hebe kes nikare êrîşê bîne ser rastiyê."

## Gotinên pêşiyan

**Sazkirina pirtûkxaneyê, bi qasî çêkirina îbadetxaneyê pîroz e. Mêr bi navê xwe, teyr bi refê xwe, birûsk bi zeriya xwe, şêr bi lepê xwe, zilam bi cîraniya xwe li dinê dimînin.**

## Ferheng

## Epîstemolojî

**Epîstemolojî şaxê felsefeyê ye ku li ser avahî û rastdariya zanîna mirovî lêkolîn dike. Di navbera epîstemolojî û mantiqê de ferqeke bingehîn heye. Mantiq avahiya ramana derbasdar dikole û prensîbên encamdana derbasdar aşkera dike. Epîstemolojî, ji aliyê din ve, bi avahiya her kiryarê zanînê re mijûl dibe. Bi dîsîplînên wekî epîstemolojî, ehlaq, civaknasî û felsefeya olê re di nava pêwendiyeke berdewam de ye.**

**Ji van her du hêmanên pêvajoya zanînê re ku bi giştî weke têkiliya di navbera mijareke zana û mijareke naskirî de tê lêkolandin, wate û giraniyên cihêreng dayîna van her du hêmanên pêvajoya zanînê, di dirêjahiya dîrokê de bûye sedem ku têgihiştinên cuda yên felsefeya zanînê peyda bibin. Têgihiştinên ku zêdetir li ser nesneyê disekinin realîst, yên ku zêdetir li ser mijarê disekinin wekî îdealîst tê gotin. Nêzîkatiya realîst îdia dike ku objeya zanînê bi rastî li cîhana derve heye lê nêzîkatiya îdealîst dibêje ku zanîn bi giranî ber bi nesneyên ku ji aliyê subjektê ve hatine çêkirin û bi rastî tune ne tê rêve kirin. Pirsgirêka bingehîn a felsefeya zanînê ku di vê berovajîkirinê de derdikeve holê, rastiya cîhana derve ye; Di vê çerçoveyê de felsefeya zanînê bi metafizîkê re di nava têkiliyê de ya. Pirsgirêkên din ên ku di çarçeweya heman pirsgirêka bingehîn de têne lêkolîn kirin ev in ku tiştê zanînê rast e an na, gelo naveroka zanînê di rastiya derve de hemtayek heye an na, cîhana naskirî û cîhana ku bi serê xwe û nayê zanîn heta çi radeyê li hev e.**

## Aforîzma

El-Cuneyd

**Heke min bizaniya ku li ser rûyê dinyayê zanînek ji ya me sofiyan binirxtir heye, min ê xwe bigihanda wê.**

**Eger hûn li yekî bigerin ku li derdê we guhdar bike û hewcedariyên we pêk bîne, hûn di vê serdemê de nikanin kesek wiha bibînin.**

**"Tiştên xerab jî diavêjin erdê, lê ax tim bi tiştên baş bersivê dide."**

xwebûn

9 - 15 Kanûn 2024/ e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 260

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw
Adar Gulan
Heval Dilbihar
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Fırat mahallesi 499/1. SK
100 Evler Sitesi No: 6 F **Kayapınar/ Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti
Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent
Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

Dr. Îsmet Konak

# Xoverdayîşê Agirî



Xoverdayîşê Agirî 16ê gulana 1926î de dest pêkerd. Xeylêk eşîranê kurdan nê xoverdayîşî de hemverê dewleta tirkan paştî daye yewbînî. Xoverdayîş fekafek 4 serrî ramîya

Badê ke Komara Tirkîya serra 1923yî de ronîyaye, vera şarê kurdî zî polîtîkaya "tenkîlî" hîna şîdetin bîye. Bêguman zafêrîya kurdan pergalê kemalîstan nas nêkerd û seba xoserîya xo dest pê xoverdayîşî kerd. Na çarçewa de serra 1925î de Şêx Seîd û embazanê ci xo ver dabî. Nê xoverdayîşî ra dima Agirî de xoverdayîşê bînî dest pêkerd û nêzdî 4 serrî ramîya. Nê nuşteyî de ma do behsê Xoverdayîşê Agirî bikerê.

Seke zanîyeno serra 1925î de Xoverdayîşê Şêx Seîdî bi hovî pelixîya. Şêx Seîd, xeylêk kurdê roşnvîrî û sîyasetmedarî ameyî daliqnayene. Îdareyê Mustafa Kemalî waşt serekanê eşîranê kurdan ê bînan nefî bikero. Nê konteksî de eşîranê herêma Serhadî sero teda û zextî zêdnayî. Agirî de eşîra Celalî ra Biroyê Heskê Têllî (Îbrahîm Axa) menganê verênan ê serra 1926î de raştê tedayan amebî. Cigêrayox Rohat Alakom eserê xo yê bi sernuşteyê "Rêxistina Xoybûnî û Serewedaritîşê Agirî" de ca dano zelalkerdişê Xalis Begê Sipkîyî (Xalîs Ozturk). Xalis Beg vano ke qaymeqamê Bazîdî waşt Biroyî nefîbikero. Tewr zîyade ci ra bertîl (50 zerdê madenî) waşt ke wa o nêro nefîkerdene. La Biroyî qebûl nêkerd. Bi rastî Biroyî fikrîyêne ke dewlete do ey ra dest mepano. Çike Biroyî verê cû seba menfaetê dewleta tirkan hem hemverê rûsan hem zî armenîyan têkoşîn kerdbî. Tarîxnas Kemal Suphandag dîyar keno ke Biroyî Xoverdayîşî Şêx Seîdî rê zî hetkarîye nêdaye. Bi kilmî seba nefîkerdişî tu şertêk çin bî. Labelê qaymeqamê Bazîdî tayê yewîyê leşkerî şirawitî dewa Biroyî ke wa ey bitepişê. Biro no dem dewe de nêbî û rema koyê Agirî. Bi nê hawayî 16ê gulana 1926î de Xoverdayîşê Agirî dest pêkerd. Tayê tarîxnasê tirkan ê neteweperestî nê serebûtî raste ra vejenê. Ê nusenê ke seke Yûsûf Taşo û merdimê ci sînorê Îranî ra derbas bîyî, dewanê Bazîdî de heywanî diznayê û remayê wareyanê Agirî. Goreyê înan qaso ke artêşa tirke vera "serokerdoxîye" dest pê hêrişî kerdo. Tîya de bi temamî û zelalî "rewakerdişê jenosîdî" est o.

### Eşîrê bînî beşdar bîyî

Tarîxnas Faîk Bûlût nuseno ke xoverdayîş de sifte armanc awankerdişê Kurdistanî nêbî. Têna Biroyî waştêne xo û keyeyê xo nefîkerdiş ra bixelisno. Dima ra tevgerê Biroyî roje bi roje pîlêr bî. Cigêrayox Suphandag dîyar keno ke serekê eşîra Semkanî Temirê Semkî, birayê ci Çerxo û serekê eşîra Sakanî Şêx Abdulqadir zî beşdarê tevgerê Biroyî bîyî. Hêzanê kurdan aşmanê verênan de artêşa tirke rê xeylêk zehmetîyî vetî.

### Awanbîyayîşê Xoybûnî

Gama ke pêkewtişan dewam kerdêne, Lubnan de averşîyayîşêko girîng qewimîya. 5ê teşrîna verêna 1927î de şaristanê Bhamdunî yê Lubnanî de keyeyê Vahan Papazyanî de rêxistina Xoybûnî ronîyaye. Serekê Xoybûnî yo yewin Celadet Elî Bedirxan bî. Komîteya Merkezî ya Xoybûnî de Celadet Bedirxan, Memduh Selîm, Mehmed Şukru Sekban, Haco Axa, Ramanli Emîn, Alî Riza, Mustafa Şahîn, Bozan Şahîn, Kerîm Beg, Tefik Beg, Kamîl Beg, Bedreddîn Axa, Fehmîyo Licêyij est bîyî. Goreyê maddeya 2. a nîzamnameyê Xoybûnî, armancê rêxistine awankerdişê Kurdistanê xoserî bî. Na çarçewa de Xoverdayîşê Agirî xeylê girîng bî. Seba armancê Xoybûnî şertê şênberî amade kerdbî. Bi nê hawayî Îhsan Nûrî Paşa teşrîna verêna 1927î de bi destê Xoybûnî sey serleşker yan sey Fermandarê Hêzanê Çekdaran ê Kurdan erşawîya herêma Agirî. Dima ra na menge de Komara Agirî ameye îlan kerdene. Îhsan Nûrî Paşayî alaya komare kaşanê Koyê Agirî de ronaye û yew zî bestaya marşa neteweyî kerde. Yeno nuştene ke no dem rojname Agirî bi destê Îhsan Nûrî Paşayî weşanîya. Qanûnê Bingeyî yê Komara Agirî zî est bî. Nuştox Huseyîn Kalkan meqaleyêka xo de dîyar keno ke qanûnê bingeyî 12 maddeyan ra ameyêne ware. Goreyê nê maddeyan hukmatê kurdan virazîya, vera heme şaran nîjad û bawerîye ferq nêkenê nêzdîbîyayîşo têduşt îlan bî, talankerdişê milkanê dewlete û şexsî qedexe bî, birê ke hetê mehkemeyanê tirkan ra dîyayî ameyî betalkerdene.

### Xoverdayîş de cinîyî

Serra 1927î de eşîra Hesenan ra Ferzende Begê Hesenî zî beşdarê xoverdayîşî bî. Tarîxnas Ahmet Kahraman eserê xo yê bi sernuşteyê "Serewedaritîşê Kurdan" de nuseno ke Ferzende Beg xoverdayîş de mêrxasîyêka girse keno. Xora Qadrî Cemîl Paşa vîrameyîşanê xo de Ferzende Begî sey "abîdeya gandare" pênas keno. Têna Ferzende Beg nê, cinîya ci Besra Xanime û maya ci Asîye Xanime zî tewrê pêkewtişan bîyî. Bi rastî Xoverdayîşê Agirî de cinîyan rolêko gird kaykerdbî. Mîsal maya Biroyê Heskê Têllî Mirdêsî Xanim û cinîya ci Rabîa Xanime zî vera artêşa tirke têkoşîn kerd. Faîk Bulut dîyar keno ke Mirdêsî Xanime serra 1928î de netîceya hêrişê teyare de pistanê xo ra dirbetin bîya û lajê xo rê nîya vato: "Ez zaf kokim a. Poxê dirbeta mi ra zêde nêeşkena biciwî, la Homayî rê sipasdar a ke ez do seba şarê kurdî bimirî". Xerza nê cinîyan, cinîya Îhsan Nurî Paşayî Yaşar Xanime zî tewrê xoverdayîşî bîye. Kitabê Sedat Ulugana û Kumru Toktamişî "Serewedaritîşê Agirî de Cinîyêka Stenbolije: Vîrameyîşê Yaşar Xanime" de nusîyeno ke Yaşar Xanime seba resayîşê mêrdeyê xo xeylêk zehmetîyî antê û netîce de serra 1928î de resaya cayê xoverdayîşî.

### Halîs Begê Sipkî

Xoverdayîşê Agirî de merdimanê xirtîyan ra yew zî Halîs Begê Sipkî bî. Halîs Beg qezaya Dûtaxî ya Agirî ra yeno. Keyeyê ci hertim xoverdayox bî. O zî sey Ferzende Begî hem mîyanê kadroyanê îdareyî de bî hem zî sey serkêşê gerîlayan pêkewtişanê germîyan de ca girewtbî. Tewr zîyade serra 1928î de Halîs Beg, Ferzende Beg û Îhsan Nûrî Paşa pîya beşdarê pêvînayîşanê aştîye bîyî.

### Keyeyê Biroyî

Mîyanê pêkewtişan de bi taybetî keyeyê Biroyê Heskê Têllî têkoşînêko bêhempa kerd. Cigêrayox Rohat Alakom dîyar keno ke 3 lajê Biroyî Îlhamî, Omer, Davut, birayê ci Ahmed Axa û Eyub Beg beşdarê xoverdayîşî bîyî. Yeno nuştene ke lajê Eyub Begî teyarêka tirkan daye waro. Reyna zî Ahmed Axa demê pêkewtişan de ame qetilkerdene. Xora cor de qalê maye û cinîya Biroyî ame kerdene.

### Efa serra 1928î

Dewleta tirke serra 1928î de efe vete. Armancê aye vindarnayîşê Xoverdayîşê Agirî bî. Mîyanê merdimanê dewlete de tayê kurdê "vileçewtî" duştê efe bîyî. Mîsal Suleyman Nazîfî waştêne ke êyê ke xover danê, wa pêro bêrê qirkerdene. Zanîyeno ke Nazîf, Amed ra bî û lajê Kurd Said Paşayî bî.

### Serebûtê serra 1930î

Rixmo ke dewleta tirke efe vete, pêkewtişî ramîyayî. Kurdan vera artêşa tirke mêrxasane têkoşîn kerd. Îdareyê Mustafa Kemalî neçar mend, kanûne 1929 de mabênê Mustafa Kemal, Fevzî Çakmak û Îbrahîm Talî Ongorenî de kombîyayîşêk qewimîya. Netîceya kombîyayîşî de seba hêrişêkê hîrayî qerar gêrîya. Nuştox Ordîxane Celîl nuseno ke 11ê hezîrana 1930î de artêşa tirke vera xoverdayoxan dest pê hêrişî kerd. Rojanê verênan de xoverdayoxan xeylêk leşkerê tirkan tepiştî û serkewte bîyî. Labelê dima ra roje bi roje înan serdestîya xo vîndî kerde. Goreyê çapemenîya Ewropa 15ê temmuze de derûdormeyê Agirî de hema hema 60 hezar leşkerê tirkan û 100 hebî teyareyî est bîyî. Artêşa tirke bi taybetî hêrişê hewayî serûber kerdî û xeylêk dewê kurdan bombarduman kerdî.

### Qetlîyamê Zîlanî

Hêrişî bêguman Wan de gelîya Zîlanî de xeylê bişîdet bîyî. Bi hezaran kurdî bi destê artêşa tirke xedarane ameyî qirkerdene. Hûmara kesanê ke ameyî qetilkerdene binîqaş a. Rojnameyê tirkan Cumhurîyet 16ê temmuza 1930î de nuseno ke "Hêrişê Zîlanî de hûmara înanê ke ameyî îmhakerdene 15 hezar a. Çemê Zîlanî heta fekî bi meyîtan pirr bîyo." Tayê çimeyan de nusîyeno ke 47 hezar kurdî Zîlan de ameyî qirkerdene. Qetlîyamî ra çend hewteyî dima Wezîrê Edaletî yê Tirkîya Mahmut Esat Bozkurtî wina vat: "Tirk wayîr û efendîyê nê welatî yo yew o. Êyê ke rîçikê tirkan ra nênê, wayîrê yew heqe yê: heqa xizmetkarbîyayîş û bendebîyayîşî."

### Netîceya xoverdayîşî

Qetlîyamê Zîlanî ra dima Agirî de têgêrayîşê "tenkîlî" dest pêkerd. Tarîxnas Ahmet Kahraman dîyar keno ke êlule 1930 de kurdan Agirî de kontrol vîndî kerd. Rixmo ke dima ra tayê pêkewtişê qijî qewimîyayî, xoverdayîşê Agirî serkewte nêbî. La xoverdayîşê 4 serran artêşa tirke rê xeylêk zehmetîyî vetî.

### Çarenusê Biroyê Heskê Têllî

Serkêşê xoverdayîşî Biroyê Heskê Têllî derbasê Îranî bîbî. Hetê Makuyî de serra 1931î de netîceya pêkewtişan de amebî kiştene. Abdurrahman Qasimlo vano ke Biro mîyanê şarî de zaf ameyêne heskerdene. Tewr zîyade seba ey şuwarêke amebî vatene: "Rawurze Biro rawurze! Qey to destûr da ke Agirî birijîyo".